# Tecrîd bi piştevaniyê têk diçe

**Endamên Yekitiya Hiqûqnasên Cîhan û Ewropayê da zanîn ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd derqanûnî ye, polîtîk e û bi tenê bi piştevaniyê dikare ji holê were rakirin**



### LI ÎMRALIYÊ ÇEWISANDINÊN CIDÎ HENE

Nûnerên asta bilind ên Yekitiya Hiqûqnasên Cîhan û Ewropayê ku ji bo Konferansa Hiqûqê hatin Tirkiyeyê diyar kir ku bi OHAL'ê re demokrasiya li Tirkiyeyê bi temamî ji holê hatiye rakirin, şert û mercên salên 1980'yî di meriyetê de ne. Hiqûqnasan anî ziman ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan polîtîk e û bi hevgirtin û piştevaniyê dikare ji holê bê rakirin. Hiqûqnasan got ku li ser Ocalan çewisandinên cidî hene...

ROJEVA
# Medya
18 Çile Çarşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 69

### BI RÊYA HIQÛQÊ ÇARESER NABE

Sekreterê Giştî yê Yekitiya Hiqûqnasên Demokrat a Navneteweyî Jan Fermon diyar kir ku divê dawî li tecrîdê bê û destnîşan kir ku Tirkiye destûra rakirina tecrîdê nade û got ku ew di wê qenaetê de ye ku dê ev rewş bi hiqûqê çareser nebe û wiha got: "Bi pêwendiyeke navneteweyî û bi yekitiyeke civakî rakirina tecrîdê pêkan e."... RÛPEL - 7

**Ciwanên Rojava ji bo Ocalan meşiyan.**



## Dê gel ji faşîzmê re bibêjin 'na'

Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen di komcivîna partiya xwe de axivî û da zanîn ku ew ê di referandûmê de dengê 'na' bi kar bînin û wiha bang li bloka AKP û MHP'ê kir: "Madem hûn ji xwe bawer in de fermo werin, rêjeya dengê we ji sedî 65 bû em ji sedî 13 in, de werin."... RÛPEL - 6



## Li dijî DAIŞ'ê xwe diparêzin

Li Afganistanê jinên ku li dijî DAIŞ'ê şer dikin, diyar kir ku dê heta dawiyê li dijî çeteyên hov parastina xwe bikin. Jinan destnîşan kir ku heke çek ji bo wan bên dayîn dê hejmara xwe zêdetir bikin û ev tişt got: "Em ê cesaret û vîna jinên afgan nîşanî tevahiya cîhanê bidin."... RÛPEL - 2



## Artêşa tirk li Babê komkujî pêk aniye

Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê bi rapora xwe aşkera kir ku artêşa tirk a xaka Sûriyeyê dagir kiriye bi tenê li herêma Şehbayê 76 jê zarok, 332 sivîl qetil kirine û zêdetirî 2 hezar û 300 sivîl jî ji ber êrîşan seqet mane û bi qasî 27 hezar sûriyeyî ji ber êrîşan koçber bûne... RÛPEL - 5

# Federalî bihûşta çolê ye

Di van rojan de ku der barê çarenûsa Sûriyeyê de civîn li ser civînê tên lidarxistin ji eşîrên ereban heta meclisa dameziriner a federaliyê peyamên 'federalî çareseriya herî guncaw e' tên dayîn. Wezîrê rûs Lavrov jî got ku ew nêzî federaliyê ne



### RÊYA JIYANA HEVPAR

Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Foza Yûsif diyar kir ku tercîh û daxwaza gelên Sûriyeyê jiyaneke wekhev û demokratîk e û ev jî bi federaliyê pêkan e.

### ŞANSÊ ASTANYÊ TUNE YE

Yûsif destnîşan kir ku di civîna Astanayê de ji ber ku hêj nûnerên gelên Sûriyeyê nahetine vexwendin, şansê serkeftina vê civînê jî tune ye û civînên bêencam ên Cenevreyê bi bîr xistin...

### PEYAMA EŞÎRÊN EREB

Eşîrên herî mezin ên Reqqayê di bin sîwana Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê de kom bûn û got ku ew piştgiriyê didin federaliyê. Eşîran bang li ciwanan jî kir ku tev li nav refên HSD'ê bibin...

### FEDERALÎ GUNCAW E

Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov beriya civîna Astanayê daxuyaniyên girîng dan û diyar kir ku ew ê li gorî daxwaza gelê Sûriyeyê tev bigerin û ew nêzî federaliyê ne...

### GOREYÊ PÊAMEYÎŞAN BENO

Endamê Meclîsê Ortax yê Taxa Şêxmeqsûdî ya Helebî Yasîr Tîtî, kombîyayîşo ke Astana de bêro viraştiş ser o wina va: "Kombîyayîşê Astana goreyê tayê pêameyîşan virazîyeno." ... R4/5/8/11

**Şengalo 'pir xwediyo'... Nivîsa Gulê Algunerhan** R6

## Neynika dadgeha tirke: Cînayetê Dînkî

Qetilbîyayîşê Hrant Dînkî ser ro 10 serrî vîyartî la hema zî qatilî nêameyî dîyayîş. Dadgeha ke wextêk qatilî mîyanê Ergenekonî de gêrayêne, nika zî mîyanê cematê Gulenî de gêrena. Pratîkê 10 serrî yê dadgehî nuqtaya ke dadgehe ewro resayo nîşanê ma dano... R - 11



Endamê Akadamîya Îlmê Komelkî Ozgur Denîz

## Tirkîya ver bi rijîyayîşî şona

**Endamê Akadamîya Îlmê Komelkî Ozgur Denîzî wina va: "Tirkîya nika rijîyayîşêk cuyena û yewîya kurdan ra tersena"**

Endamê Akadamîya Îlmê Komelkî ya Abdullah Ocalanî Ozgur Denîzî derheqê krîzê sîyasî yo ke Tirkîya û Rojhelato Mîyanên de yeno cuyayîş de qisey kerd û wina va: "Tirkîya nika mîyanê rijîyayîşêk de ya û yewîya kurdan ra tersena."... R - 10

www.rojavakurdi.org

## Polîs li şaredariyê jinan tacîz dikin




**PIŞTÎ KU QEYÛM** li Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê hat bicihkirin, avahî veguheriye qereqolê. Polîsên ku di nava avahiyê de digerin, xebatkarên jin tacîz dikin. Personeleke jin a şaredariyê ku nexwest navê xwe aşkera bike anî ziman ku tacîza polîsan li ber deriyê avahiyê dest pê dike, li nava avahiyê û li her cihên şaredariyê heta dawiya kar dewam dike. Xebatkara şaredariyê diyar kir ku polîs li her beşa avahiya şaredariyê hene û ev tişt got: "Tacîz danê sibehê bi hatina kar dest pê dike. Jinên ku dikevin hundirê avahiyê, ewilî bi awiran tên tacîzkirin. Piştre di nava kar de li korîdorên odeyan dewam dike. Li vir bi devkî tacîzan dikin, piştî kar jî daxwaza hevdîtinê li personelên jin tê kirin. Em nizanin bê em ê çi bikin." Personela şaredariyê anî ziman ku tacîz roj bi roj giran dibe û eger pêşî lê neyê girtin, dibe ku rewşeke hê nebaş rû bide. MÊRDÎN – DÎHABER



## Têkoşîna jinan hedef tê girtin

Hevsroka HDP'ê ya Stenbolê Aysel Guzel di operasyona siyasî ya li dijî HDP'ê de hat binçavkirin û hat girtin. Guzel bi hevkariya parêzerê xwe ji girtîgeha jinan a Bakirkoyê nameyek şand. Ayselê girtina xwe wek biryareke siyasî nirxand û wiha got: "HDP partiya jinan e. Jinên di nav HDP'ê de siyasetê dimeşînin têkoşîna rizgariya jinan jî dimeşînin. Em dibînin ku bi taybetî di operasyonên li Stenbolê de êrîşî jinan dikin. Divê jinên HDP'î berpirsyariya xwe ya siyasî bi cih bînin." Guzel bi lêv kir ku di bin çavan de rastî şîdeta psîkolojîk hatiye û ji bo girtina xwe jî wiha got: "Ev biryareke siyasî ye. Ev êrîş ji bo HDP'ê ji zemîna siyaseta demokratîk dûr bixin, tên kirin." STENBOL - ŞÛJIN



## Hêviya jinan mezin e

Êzidiyên ji ber êrîşa DAIŞ'ê li Çiyayê Şengalê bi cih bûn ev zivistana wan a sêyemîn e ku li çiyayan derbas dikin. Li çiyayan zivistan dijwar derbas dibe û şilî zêde ye. Jinên Şengalê jî da zanîn ku tevî hemû zor û zehmetiyan 'axa wan bedela her tiştî ye'. Xezal Elî ya sê zivistan e li vir dijî anî ziman ku piştî mala wan hatiye hilweşandin kon vedaye û wiha got: "Çi qas jî jiyan zehmet be em dizanin ku em li ser axa xwe ne. Ev der warê me ye. Ev fikr jî hêviyê dide mirovan." ŞENGAL – ŞÛJIN



## Jinan kongreya xwe pêk anî

Komuna Jinan a li Ulmê ya Almanyayê, kongreya xwe pêk anî. Kongre bi dirûşma "Hebûna Serok xwebûna me ye" hate lidarxistin. Di kongreyê de komîsyonên Têkiliyên bi Gel re, PYD, Jin, Aştî û Lihevkirin, Têkiliyên Derve, Civakî, Çandî û Bawerî hatin avakirin. Di kongreyê de Meclisa Komunê ya ji 24 kesî hate hilbijartin û ji bo berdevkiya komunê jî 3 kes hatin diyarkirin. Jinan di dawiya kongreyê de wiha got: "Rêya Sakîneyan rêya me ye." ULM

# Jinên afgan dest bi parastina rewa kir

**Li Afganistanê jinên ku li dijî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê çek hilgirtin, diyar kir ku dê heta dawiyê li dijî van çeteyên hov parastina xwe bikin û wiha got: "Em ê cesareta jinên afgan nîşanî tevahiya cîhanê bidin."**



Li navçeya Darzab a bajarê Cucan ku dikeve başûrê Afganistanê jinan li dijî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê cara yekemîn çek hilgirtin û dest bi parastina xwe kir. Jinên ku li gundê Gerîmcer ê Darabê dijîn piştî ku malên wan ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatin hilweşandin û zarokên wan hatin qetilkirin çek û rext girê dan û li cihên bejahî dest bi berxwedanê kir.

Ji van jinên ku xwe bi çek kir, jina bi navê Ay Cemal, diyar kir ku çeteyan gundê wan wêran kir, zarok û hevjînên wan kuştine û bi lêv kir: "Me jinan ji bo ku xwe û gelê xwe biparêzin çek hilgirt û em ê heta dawiyê li ber xwe bidin. Em ê hêza jinên afgan û cesareta wan nîşanî tevahiya cîhanê bidin."

Ji van jinên berxwedêr Badam Gul jî diyar kir ku beriya 3 mehan lawê wê yê ku li dijî van endamên çeteyên DAIŞ'ê li ber xwe da, birîndar bû û li nexweşxaneyê tedawiya wî didome û got: "Pêşeroja me ne diyar e. Belkî çeteyên DAIŞ'ê me jî bikujin. Ji ber vê em ji bo parastina xwe çekan dixwazin." *AMED - ŞÛJIN*

## Ji weziyan Kobanê silav kirin

Şervanên YPJ'ê yên ku di hemleya 'Xezeba Firatê' de cihê xwe digirin, ji çeperan silav li salvegera rizgarkirina Kobanê kirin û got: "Çawa me mohra xwe li berxwedana Kobanê xist, em ê mohra xwe wek YPJ li Reqqayê jî bidin."

Şervana YPJ'ê Denîz Rojhilat diyar kir ku ew wek şervanên Yekîneyên Parastina Jinan di nava hemleya Xezaba Firatê de xwedî cihekî çalak in û wiha got: "Destpêkê em salvegera rizgarkirina Kobanê li hemû gel û hevalên xwe pîroz dikin. Azadiya me bi azadiya gelê me ve girêdayî ye. Ji ber vê yeke em ê heta dawiyê di nava berxwedanê de bin. Em niha jî di hemleya Reqqayê de li ber xwe didin. Em ê wek jin bi serkeftineke mezin jinên ku li Reqqayê dijîn ji zilma çeteyên DAIŞ'ê rizgar bikin. Wek şervanên YPJ'ê tevahî şervanên ku di berxwedana Kobanê de cih girt û jiyana xwe ji dest da, bi bîr tînin. Heya dilopek xwîn di canê me de hebe em ê li ber xwe bidin. Heya azadiya Rêbertî û gelê me dê têkoşîna me bidome."

**NÊZÎ RIZGARKIRINÊ NE**

Bêrîtan Cûdî jî anî ziman ku ew ji bajarê Minbicê ye û ereb e û got ku ew cihê xwe di hemleya Xezeba Firatê de digire. Cûdî bi lêv kir ku ew ji çeperên Reqqayê sekna YPJ û salvegera rizgarkina Kobanê pîroz dike û wiha axivî: "Em niha li cebheyên Reqqayê ne. Em jî wek YPJ cihê xwe di hemleyê de digirin. Em nêzî rizgarkirina Reqqayê dibin. Em dizanin ku Kobanê bi ruh û berxwedana YPJ'ê rizgar bû. Çawa me mohra xwe li berxwedana Kobanê xist, em ê mohra xwe wek YPJ li Reqqayê jî bidin. Em silavên xwe li salvegera rizgarkirina Kobanê û berxwedana wê dikin." *REQQA - ŞÛJIN*



## Ji bo azadiya gelê xwe tê dikoşe

Yek ji jinên ku li Şengalê ferman dît, Zehra Silêman Şengalî ye. Zehra niha yek ji rêveberên Tevgera Azadiyê ya Jinên Êzidxanê (TAJÊ) ye. Ji bo jinên êzidî careke din neyên kuştin, ji bo ku tu carî wek koleyan neyên firotin, tê dikoşe.

Zehra Şengalî da xuyakirin ku dema ew li benda mirinê bûn, bihîst ku YPG'ê korîdorek ber bi Rojava ve vekiriye û hêviya xwe ya wê çaxê wiha vegot: "Roja 8'ê tebaxê kekê min telefon vekir. Got ku YPG'ê rê vekiriye. Ev yek bi rastî jî ji bo me bû rojeke nû û jiyaneke nû dest pê kir."

Zehra Şengalî ragihand ku tevî ku wê jî di rê de tehde dît, dema xwe gihand Rojava yekser dest bi alîkariya mirovên ji komkujiyê rizgar bûn, kir. Şengalî anî ziman ku bi tecrûbeya xwe ya li jiyana kampa Newrozê ew bêhtir zane bû û bihîst ku dê Meclisa Gel a Şengalê ava bibe û got: "Min biryar da ku ez vegerim Şengalê. Ji bo kongreya damezirandinê ya Meclisa Gel a Şengalê, ji kampa Newrozê em 30 kes çûn. Di nava me de hevalên ji rêxistina ciwanan jî hebûn. Li aliyekî şer dewam dikir, li aliyê din jî me civînên xwe pêk dianîn. Di nava van de ez jî hebûm. Wekî din, 7 jinên endamên meclisê bûn. Ev yek ji bo jinên êzidî yên tiştekî gelekî mezin bû." Şengalî da zanîn wek jineke êzidî piştî ku nêrînên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nas kirin, jiyana wê guherî û êdî ji tu tiştî natirse. *DÊRIK - ANF*



## Pergal ji hêz û vîna jinan ditirse

Jinên bajarê Til Temir a Kantona Cizîrê der barê êrîşên li ser jinan a di warê siyasî û civakî de nirxandin kirin. Jinan diyar kir ku hêzên desthilatdar û mêr ji ber ku ji hêza jinan a birêxistinkirî ditirsin, êrîşan pêk tînin. Rêvebera Navenda Têkîliyên Kongra Star a bajarê Til Temir Elya Oglo da zanîn ku li hemberî jinan gelek cureyên tundiyê pêk tên û wiha got: "Hem di qada siyasî hem jî di qada civakî de. Pergal bi aweyekî dijwar jinan hedef digire. Divê jin li hemberî her cure êrîş parastina xwe esas bigirin. Armanca pergala desthilatdariyê ew e ku vîn û hêza jinan bişkîne. Pêwîst e hemû jin li hemberî vê rewşê dengê xwe derxin û daxwaza mafên xwe bikin."

Rêvebera Kongra Star Terfa Fewaz jî wiha axivî: "Em êrîşên li ser jinan bi taybetî qetilkirin û revandina wan bi tundî şermezar dikin. Divê hemû jin xwedî li vîna xwe derkevin da ku dijmin nekare destê xwe dirêjî me bike. Em hemû jin dê destekê bidin hev û li hemberî vê rewşê bisekinin. Em ê bixebitin heta ku ev rewş bi dawî bibe. Bila êrîşkar jî baş bizanin ku em li hemberî vê rewşê tu carî bê deng namînin." *TIL TEMIR - ŞÛJIN*

www.arsivakurdi.org

## Li Sûrê 4 polîs hatin kuştin

Li Baxçeyên Hewselê yên di navbera Çemê Dîcle û Navçeya Sûr a Amedê li qada ku moloz lê dihatin rokirin, teqîn pêk hat. Dema otobusa polîsên hêzên çevîk derbas dibû teqîn pêk hat. Li gorî agahiyên ewil di teqînê de 4 polîsan jiyana xwe ji dest da û 2 polîs jî birîndar bûn. Gelek ambulans hatin cihê bûyerê û polîsên birîndar rakirin nexweşxaneyên Amedê. AMED



## Salek e li benda îdianameyê ye

Li Manîsayê, belavkarê rojnameyên Ozgur Gundem û Azadiya Welat Semîh Elîtaş ê dema di 9'ê adara 2016'an de ji bo wergirtina rojnameyên ku bi kargoyê hatin şandin çû, ji aliyê polîsên şaxa TEM'ê ya Manîsayê ve hatibûn binçavkirin. Di fezlekeya polîsan de hat îdiakirin ku Elîtaş bi firotina rojnameyan piştevaniya fînansmana rêxistinê dike û hat girtin, ev nêzî salekê ye li girtîgehê li benda amadekirina îdianameyê ye. MANÎSA



## Çawişê pispor jinek qetil kir

Li navçeya Karitepe ya Kocaelî, çawişê pispor Alper Devecî êrîşî malbata hevjîna xwe kir. Alper a ku xwest di vê navberê de hevjîna xwe Aynur Devecî qetil bike, xesî Nurhan Y. û dişa wî Aysun Bozcan li dijî wî derketin. Li ser vê yekê Alper gule berdan xesî û dişa xwe jî û di encamê de Aysun hat qetilkirin. KOCAELÎ – ŞÛJIN



## 21 girtî hatin sirgûnkirin

Hat zanîn ku 21 girtiyên li Girtîgeha Tîpa E a Sêrtê dimînin di 13'ê çileyê de bêyî agahî bidin malbat û parêzerên wan, sewqî girtîgehên cuda hatine kirin. Malbat dema çûn hevdîtina xizmên xwe, rayedarên girtîgehê ji wan re ragihand ku girtî hatine sewqkirin. Di nava girtiyên hatine sewqkirin de girtiyê nexweş ê epîlepsiyê ku rewşa wî giran e, Veysel Akkurt jî heye. SÊRT



# Di bin çavdêriya polîsan de tiryak tê firotin

Li Sûra ku ev demeke dirêj e di bin dorpêçkirinê de ye, ciwanekî ku ew bi xwe jî tiryakkêş e, diyar kir ku li Sûrê her ku diçe esrar û tiryak zêde dibe, her tişt di bin çavdêriya polîsan de pêk tê û polîs çavên xwe li vê yekê digirin



Li navçeya Sûrê ya Amedê ya ku li ser her kuçe û kolanên wê hema bêje noqteyên venêrînê yên polîsan hene, tiryakkêşan navçe ji xwe re kiriye mesken. Ciwanekî tiryakkêş der barê peydakirina tiryakê, bazirganî û temîna wê de agahî dan. Ciwan destnîşan kir ku bi taybetî tiryak ji aliyê ciwanan ve tê peydakirin, lê polîs jî xwe li nezanînê datînin û da zanîn ku di serî de navçeya Sûrê li gelek deverên bajêr bazirganiya tiryakê zêde bûye. Ciwan anî ziman ku ew 12 sal e esrarê dikêşe, lê her cara hewl dide dev jê berde, rastî tacirên tiryakê tê.

Ciwanê 29 salî diyar kir ku bi taybetî jî li taxa Alîpaşa ya Sûrê li her kuçeyê esrar tê kişandin û firotin û wiha pê de çû: "Gelekî dixwazim dev ji esrarê berdim. Lê her tim kesên esrarê difiroşin min peyda dikin. Zarokên 10-12 salî wekî ku nokan bifiroşin, li her kuçeyê esrarê difiroşin. Ev rewşa ciwanan a tevizandî li gorî dilê polîsan e û ji ber vê xwe li nedîtiyê datînin."

Ciwanê tiryakkêş anî ziman ku heke tedbîr bên girtin dê ne firotina wê ne jî kêşana wê pêk bê û wiha bi lêv kir: "Ez ê jî bi vî awayî bikarim dev jê berdim. Lê dema diçim Sûrê, li kuçeyê zarokekî 10 salî jî dipirse, 'dixwazî?' Dema tu biçî taxa Alîpaşa ya Sûrê, heke tu eleqa te bi tiryakê tune be jî tên û te peyda dikin." *AMED - DÎHABER*

## TOMA dê li pêy edaletê be!

Baroya Edeneyê, bi mebesta mudaxilî bûyer û dozên civakî bibe, bi navê TOMA (Lijneya Şopandina Doz û Mudaxeleyên Bûyerên Civakî) yekîne ava kir. Serokê Baroya Edeneyê Velî Kuçuk ê der barê yekîneya ku bi biryara lijneya rêveberiyê hat avakirin, axivî û wiha got: "Bi mebesta şopandina doz û bûyerên civakî yên wekî herî dawî li wargeha xwendekaran şewitîbû me hewldaneke wisa ava kiriye."



Kuçuk anî ziman ku ew ê di dosyeyên ku mudaxilî wan dibin de, parêzerên xwedî tecrube peywirdar bikin û wiha axivî: "Em ê di bûyera şewata Aladag û bûyerên din ên civakî de, bi şopandina taybet a hevalên xwe yên di lijneyê de bimeşînin. Çawa Navenda Mafên Jinan, Navenda Mafên Parêzeran, Navenda Mafên Staj Perwerdehiyê yên baroyê hene, dê TOMA jî der barê mijarên civakî de bibe navendek."

Kuçuk diyar kir ku kesên di bûyerên civakî de hatine mexdûrkirin dikarin bi awayekî şexsî jî serî li TOMA'yê bidin û anî ziman ku piştî facîaya şewatê ya li Aladagê, wan serdana malbat û birîndaran kiriye û xwestiye demildest mudaxilî vê lêpirsînê bibin. *EDENE - DÎHABER*

## Sûr kirine navenda rantê



Serokê Lijneya Rêveberiya TMMOB'ê Emîn Koramaz ê serdana navçeya dîrokî Sûrê ku hîn jî qedexe û rûxandin lê didome kir anî ziman ku veguherandina Sûrê ya wekî xirbeyan, encama polîtîkayên şîdetê ya îktîdara AKP'ê ye, mebesta plankirina çêkirina 6 qereqolan jî ji bo peydakirina navenda rantê ya ewlehiya alîgirî ye û ew ê pêşnûmaya ku Sûrê ji dest gelê Amedê derdixîne, bibin darazê.

Koramaz anî ziman ku îktîdara AKP îktîdareke piyaseker e û got ku li welatê ku krîza aborî lê heye ji bo rantê ji alîgirên xwe re peyde bike, Sûrê xistiye serê xwe ji feydeya cemaweriyê bêtir, ketiye derdê ku vî welatî ji bo alîgirên xwe, berjendîparêzên xwe bide bazarkirin.

Koramaz diyar kir ku pêşnûmaya îmarê ya bi mebesta parastinê raçînga xwemal a Sûrê xera dike û şopên dawîn ên eremniyan jî ji holê tên rakirin û anî ziman ku mebesta li navçeyeke biçûk avakirina 6 qereqolên mezin û bi blokên betonî dorpêçkirina temamiya navçeyê, tenê ji bo komên xwe yên berjewendiyê qadeke ewleyiyê çêbike bi xwe ye. Koramaz destnîşan kir ku ew ê wek TMMOB'ê guherandina Plana Bi Mebesta Parastinê bibin darazê. *AMED - DÎHABER*

## Dozger xwest êrîşkar biparêze

Li Nexweşxaneyeke Zanîngehê pisporê zayînê Prof. B.E. nexweşa xwe ya jin N. tacîz kir. B.E. yê ku N. bi tacîzê re rû bi rû hişt, li malê li ser wê derî kilît kir. Jina ku derî li ser wê hat kilîtkirin piştî ku derket pacê û alîkarî xwest ji aliyê B.E. ve hat astengkirin. N. vê carê jî ji bo ku xwe biparêze pêçiyên B.E. gez kirin. N. ya ku piştî ji B.E. rizgar bû ji cîranan alîkarî xwest. Li ser giliyê N. der barê B.E. de li Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê bi daxwaza 22 sal cezayê girtîgehê doz hat vekirin. Lê li ser giliyê B. E. der barê N. de jî doz hat vekirin û ji bo N. jî heta 6 salan ceza hat xwestin. Dozgerê dozê xwest ku êrîşa li N. hat kirin wek parastinê bê dîtin. Her wiha dozên der barê van kesan de hatin vekirin dê di rojên pêş de danişîna wan bê kirin. *STENBOL - ŞÛJIN*

## Girtiyan bê hewa dihêlin

Ji Girtîgeha Tîpa F a Kiriklar a Îzmîrê li ser navê girtiyên ji dozên PKK, MLKP, MKP û DKP'ê Fethullah Demirtaş, Mahzar Guler, Mustafa Oner, Serkan Gungor name şandin û di nameyan de bal kişand ser binpêkirinên mafan ên li Girtîgeha Kiriklarê.

Di nameyên de hate ragihandin ku bi awayekî kêfî amûrên wan tên desteserkirin, di dema çûn û hatina nexweşxaneyê de tên kelepçekirin, girêdana bi leşkeran tê ferzkirin û ser hewadariya koguşên ku lê dimînin dixwazin bi têlan bigirin.

Girtiyan di nameyên xwe de diyar kir ku li girtîgehan binpêkirinên mafan ên ji berê heta niha didomin, bi OHAL'ê re çewisandin, îşkence û pêkanînên tecrîdê zêde bûne û wiha domandin: "Bi mehan e em nikarin derkevin sohbetan, eşyayên malbatên me tînin, nadin me. Gelek amûrên me bi awayekî kêfî hatine desteserkirin. Ji ber agahî dane postexaneyên bajêr, eşyayên ku malbat bi rêya kargoyê dişînin, nagirin. Her wiha eşyayên tên jî, bêyî haya me jê hebe dubare li malbatan tê vegerandin." *ÎZMÎR - DÎHABER*



## DMME'ê têkildarî 'Ceylan Onkol' biryareke balkêş da

Ceylan Onkol a 12 salî di 28'ê îlona 2009'an de li gundê Şenlik ê Licê ya Amedê dema ku pezê xwe diçêrand, bi topeke ku ji Qereqola Yaylayê ve hatî avêtin hatibû qetilkirin. Malbata Ceylan Onkol serî li Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) dabû, lê dadgehê di mijarên binpêkirina heqê jiyanê de û di berpirsyariya lêpirsîna karîger de kêmasî nedîtin. Mafê malbatê heye ku di nav 3 mehan de ji bo îtîraz bike serî li Rêveberiya Bilind bide.

Her wiha her çendî ji DMME'yê hatibû xwestin ku ji hikûmetê, ji ber sedema êşa manewî ya malbatê kişandî, parastinê bixwaze jî di biryarê de têkildarî îdiayê tiştek nebû.

**BERIYA 7 SALAN**

Malbata Onkal 8'ê di cotmeha 2010'an de serî li DMME'yê dabû. Di gulana 2012'an de ji ber sedema ku lêpirsîn bi karîgerî nehatiye kirin û ne bêalî bûye, daxwazên kûrkirina lêpirsînê ji ber ku nehatibû qebûlkirin û li gel dema ku li sere derbas bûye, ji ber ku doz nehatiye vekirin, ji ber ku gumanbar nehatine dîtin, dîsa serî li DMME'yê dabû. *AMED - ANF*

## Li girtîgehê dîsa alozî derket



**LI GIRTÎGEHA ALCAÇUZ A** eyaleta Rio Grande do Norteyê ya Brezîlyayê ku di encama şerê di navbera 2 komên dijber de serê 26 girtiyan hatibû birîn, dîsa alozî derket. Hat ragihandin ku girtiyan di destê wan de ço û al banê girtîgehê dagir kiriye û hêzên taybet ên eyaleta Rio Grande do Norteyê jî ji bo serhildana girtiyan kontrol bikin ketine hundirê girtîgehê. Hat diyarkirin ku karmendên girtîgehê di rewşeke xeter de ne û îhtîmala hin termên din ên girtiyan li hundir hebin, heye. Parêzgerê eyaleta Rio Grande do Norteyê Robinson Faria, di daxuyaniya xwe ya li ser Twitterê de ragihand ku ew ê ji hikumeta federal daxwaza hêzên leşkerî bikin. Her wiha beriya demekê dîsa di girtîgehê de serhildanek çêbûbû û hatibû ragihandin ku di wan bûyeran de serê 26 girtiyan hatiye birîn. **BRASILIA**

# Biryara federasyonê dê gelê Sûriyeyê bide

**Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov di civîna çapemeniyê de axivî û diyar kir ku biryara federalbûna Sûriyayê ne Rûsya encax gelên Sûriyeyê dikarin bidin**

Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov duh di civîna dawiya salê ya çapemeniyê ya 2016'an a ku her sal tê kirin de, têkildarî bûyerên girîng ên ku li cîhanê qewimîn nirxandinên girîng kirin. Lavrov bi nirxandina tehdîda terorîzmê ya li hemberî civaka navneteweyî dest bi civîna xwe kir û anî ziman ku di sala 2016'an de metirsiya herî mezin terorîzm bûye û diyar kir ku ew gelek xemgîn in ku li hemberî terorîzmê eniyek hevpar ava nebûye.

Lavrov di civînê de der barê têkiliyên Rûsya û Amerîkayê de axivî û diyar kir ku servîsên îstîxbaratê yên DYA'yê di nîsana 2016'an de hewl daye ku berpirsyarên dîplomatên rûsî ber bi xwe ve bikişînin û wiha got: "Îdiayên rêveberiya Obama yên der barê dîplomatên sefareta DYA'yê de ku li Rûsyayê rastî çewsandinan tên jî, ne rast in. Gelek dîplomatên sefareta DYA'yê yên li Moskovê pirî caran beşdarî protestoyên muxalefeta Rûsyayê dibin."

Lavrov ji bo Donald Trump ku dê 20'ê çileyê dest bi kar bike jî ev tişt got: "Dê rewşa têkiliya me bi DYA'yê re piştî ku Trump dest bi kar bike diyar bibe. Em ji daxuyaniyên Trump ên der heqê tekoşîna bi terorê re bi memnûniyetî dişopînin. Ez jî wekî Trump difikirim ku her welat berpirsyarê pêşketina xwe ye. Ez pê bawer im ku dê hevkariya me ya bi ekîba Trump re der barê Sûriyeyê de ji hevkariya Obama bi bandortir be. Em ji vê memnûn in ku rêveberiya Trump ji bo hevdîtinên Astanayê yên 23'yê mehê pêk bên, hatiye vexwendin û em hêvî dikin ku beşdar bibin." Her wiha Lavrov da zanîn ku dibe Rûsya û Trump cara yekemîn li Astanayê bên ba hev û hevdîtinan bikin.

**ARMANCA ASTANAYÊ**

Lavrov têkildarî armanca hevdîtinên Astanayê got ku armanca hevdîtinên li Astanayê bihêzkirina agirbestê ya Sûriyeyê ye û ev tişt anî ziman: "Tê hêvîkirin ku qumandanên qadên muxalîf ber bi prosesa siyasî ve bikişînin. Hemû komên çekdar ên li Sûriyeyê dikarin beşdarî vê prosesa agirbestê bibin."

Lavrov der barê şandina alîkariya leşkerî ya ji bo rejîma Sûriyeyê de jî wiha got: "Hew mabû ku paytexta Sûriyeyê bikeve destê terorîstan û em gihaştin hawara wan. Me bi vê gavê kareke baş kir. Kareke gelekî girîng bû ku me terorîst têk birin û me bi artêşa Sûriyeyê re Heleb rizgar kir." Her wiha Lavrov li ser îdiayên Rûsya bi êrîşên sîber mudaxaleyî hilbijartinên welatên cîran dike got ku ev îdia hemû bê bingeh in. ***MOSKOV***



**Biryarê ne Rûsya gel dide**

**LAVROV DER** barê federalbûna Sûriyeyê de ku li Sûriyeyê yekane rêya çareseriya aloziyan e û niha bingeha wê li rojavayê Kurdistanê ji aliyê hemû gelên ku li wir dijîn ve tê avêtin jî axivî û destnîşan kir ku biryara ji bo federalbûn an jî nefederalbûna Sûriyeyê ne Rûsya encax gelên Sûriyeyê dikarin bidin. Yanî qedera xwe ew dê tayîn bikin.

## 'Di her qadê de em ê bi Trump re bixebitin'




Serokwezîra Almanyayê Angela Merkel piştî hevdîtina bi Serokwezîrê New Zealandê Bill English civîneke çapemeiyê li dar xist. Di civînê de hevpeyvîna Serokê Amerîkayê yê nû Donald Trump ku dabû rojnameya Îngilistanê ji Merkel hat pirsîn û Merkel jî di bersiva xwe de wiha got: "Demeke dirêj e em helwesta Serokê Amerîkayê Donald Trump ku wê di 20'ê çileyê de wezîfeyê ji Obama bigire dizanin û her kes jî helwesta me dizane. Em li bendê ne ku Trump wezîfeyê bigire ku em bikaribin di her qadê de bi hev re bixebitin." **WELLINGTON**

## 'Ne pêkan e ku Trump ji Obama xerabtir be'



Trump di dema kampanyaya hilbijartinê de Venezuella bi 'çewisandina gelê xwe' rexne kiribû. Lê serokdewletê Venezuellayê Nicolas Maduro yê ku nexwest bersivê bide van gotinan, dixwaze têkiliyên xwe yên li gel Washingtonê sererast bike û gotibû, "Em binêrin ka çi dibe. Em bi awayekî lez bertekê nîşan nedin, divê em bi tevdîr bin." Maduro parast ku li hemberî Trump kampanyeyeke nefretê hatiye destpêkirin û derbirî ku Obama dê bi qeyranên li Afrîka û Rojhilata Navîn, bi zêdebûna terorê û 3 darbeyên leşkerî yên li Amerîkaya Latîn were bibîranîn. **CARACAS**

## PE'yê serokê xwe yê nû hilbijart



Kesê li şûna Serokê Parlamenta Ewropayê Martin Schulz rûnê, aşkera bû. Serokê Koma Lîberal a Parlamenta Ewropayê Guy Verhostadt di kêliya dawîn de namzetiya xwe vekişand. Lîberalan û rastgiriya navendî tifaq çêkir ku ev yek dikare hevsengiyên siyasî biguherîne. Bi desteka lîberalan a ji bo Partiya Gel a Ewropayê re tê payîn Antonio Tajani bibe serokê Parlamenta Ewropayê. Serokê berê yê Parlamenta Ewropayê Martin Schulz beriya aşkerabûna encamên tûra destpêkê, namzetê Partiya Gel a Ewropayê Antonio Tajani pîroz kir. **STRASBOURG**

## 'Em ji bo hevdîtinê amade ne'

Wezîrê Karên Derve yê Kazakistanê Kayrat Abdrahmanov di daxuyaniya xwe de ragihand ku em wekî Kazakistanê bi her awayî ji bo hevdîtinên li Astanayê amade ne û wiha got: "Peşniyara min ev e; bila hevdîtinên Astanayê di dîroka 23'ê çileyê de ku hatiye plankirin werin sazkirin." Abdrahmanov diyar kir ku her tiştên der barê civînê de piştî ku lîsteya beşdaran û formata wê diyar bû dê zelal bibe.



Her wiha Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çavuşoglu û Şêwirmendê Serokomar Îbrahîm Kalin di daxuyaniyên xwe de ragihandibû ku dê hevdîtinên Astanayê di 23'ê çileyê de pêk bên. Lê ev dîrok hê jî ji aliyê Rûsya û Sûriyeyê ve nehatiye erêkirin. ***ASTANA***

## Lavrov û Zarîf li ser Astanayê axivîn

Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov der barê hevdîtinên Astanayê de bi Wezîrê Karên Derve yê Îranê Mohammed Cevad Zarîf re bi rêya telefonê axivî.

Li gorî daxuyaniya Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê Lavrov û Zarîf di hevdîtina xwe de li ser rewşa dawîn a li Sûriyeyê rawestiyane.

Her wiha hat gotin ku her du wezîrên karên derve di hevdîtina xwe de diyar kiriye ku ew ê ji bo hevdîtinên ku li Astanayê werin lidarxistin bi hemû welatan re di nav koordînasyonê de bin.

Her wiha hevdîtinên di navbera aliyên Sûriyeyê de dê di 23'yê çileyê de li Astana ya Kazakistanê pêk bên. ***MOSKOV***

## Artêşa Iraqê bi pêş dikeve

Fermandarê Odeya Operasyonê ya Nînovayê Ebdulemîr Reşîd Yarella bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku li aliyê rojhilatê Mûsilê taxa Taze, Navçeya Bab El-Şemis û bazara firotina ajalan ji çeteyan hatine rizgarkirin û derbên giran li çeteyên DAIŞ'ê xistine. Her wiha fermandarê du roj berê rizgarkirina çend taxên din li eniya rojhilat a Mûsilê yên wekî taxa Şorte, Navenda Rewşenbîrî, Elkendî, Qeyrewan, Cemase û Tirba Nebî Yunisê ragihandibû. **ANF**

## Li Misrê êrîş: 8 polîs mirin

Li gorî daxuyaniya Wezareta Karên Hundir, li herêma Wadî el Cedîd a li başûrê rojavayê Kahîreyê, li benda kontrolê ya El Naqabê li dijî polîsan êrîşek pêk hatiye û di vê êrîşê de 8 polîs mirine û 2 êrîşkar jî hatine kuştin.

Piştî ku serokomar Muhammed Mûrsî ku endamê Birayên Misilman e, di tîrmeha 2013'an de bi derbeya leşkerî hat têkbirin, li Misrê êrîşên komên îslamî yên tund zêde bûn. Di encama êrîşan de di 3 sal û nîvan de bi sedan polîs û leşker mirin. **KAHÎRE**

www.arsivakurd.org

# 28 eşîrên ereb got 'federalî'

**28 eşîrên ereb ên Reqqayê destnîşan kir ku ew piştgiriya xwe ya ji bo federaliya demokratîk radigihînin. Eşîran anî ziman ku ew ê bi tevlîbûna hemû gelan bi hev re jiyanê ji nû ve ava dikin**



Eşîrên ji pêkhateya ereb ên di bin sîwana Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê de cih digirin bi daxuyaniyekê aşkera kirin ku ew ê bi hemû hêza xwe piştgiriyê bidin federaliya demokratîk.

Bi rizgarkirina gundewarên Reqqayê ji çeteyên DAIŞ'ê tevlîbûn û piştgiriya gelê herêmê ya ji federaliya demokratîk re jî zêde dibe. Yek Şêxê eşîra Wîzze ku mezintirin eşîra li herêmê ye û ji 28 eşîran pêk tê yê bi navê Musa Şêxî diyar kir ku êdî eşîrên li herêmê biratiya gelan dixwazin û wiha dom kir: "Me ji bo alîkariya bi HSD'ê re dest bi xebatan kiriye. Em tevli operasyona Reqqayê jî bûn. Em dixwazin ji bo aştî û demokrastiyê bibin parçeyek ji pergala federaliya demokratîk."

**GEL BÛNE YEK**

Yek ji mezinên eşîra Bîgarayê Kamîl Mihemed jî got ku li dijî zilma DAIŞ'ê kurd û ereb bihevre têdikoşin û wiha pê de çû: "Em hemû niha bûne yek û bi bingeha vê yêkitiyê jî em tovê biratiyê diçînin. Yên ku dixwestin vê yêkitiyê xera bikin jî têk çûn."

**TÊKOŞÎNA HEVPAR**

Yek ji nûnerên eşîra Boasafê ku li herêma Tebqayê tê nasîn Xalid Abdullah jî ev tişt anîn ziman: "Dê hemû eşîrên ereb di bin sîwana federaliyê de bên cem hev. Dê her kes cihê xwe di vê pergalê de bigire. Hemû pêkhate bûn yek û li dijî zilmê serî rakirin. Ev yek ji bo mirovahiyê pêngaveke girînge. Em minetdarên HSD'ê ne. Em piştgirî didin wan û ji bo xurtkirina pergala federaliyê jî bang li gelên Sûriyeyê dikin." *REQQA - DÎHABER*

## Banga tevlîbûnê li ciwanan kirin

**EŞÎRÊN** ereb ên bajarê Reqqayê bi daxuyaniyekê piştgiriya xwe ya bi şervanên HSD'e re ragihandin û bang li ciwanan kirin ku tevli refên HSD'ê bibin. Di daxuyaniya ku ji hêla Şêxê eşîra El Weze (mezintirin eşîra li herêmê ye) yê bi navê Seîd Mehmûd de ev tişt hatin gotin: "Em bejna xwe li hemberî şervanên xwe ditewînin. Em amade ne ku bajar û gundên xwe di aliyê siyasî de birêvebibin û xizmeta gelê xwe bikin. Em projeya federaliya demokratîk weke çareseriya herî guncaw dibînin û piştgirî didin. Em bang li tevahiya ciwanan jî dikin kut evli hêzên HSD'ê bibin." REQQA - DÎHABER

## Bi gel re bi serkeftî pêşde diçin

Fermandarên HSD'ê diyar kirin ku bi piştgiriya eşîreyên herêmê, hemleya Xezeba Firatê biser dikeve û bi hezaran jin ji tarîtiyê hatine rizgarkirin. Der barê mijarê fermandarê HSD'ê Ebdulqadir Hivêdlî da zanîn ku piraniya hêzên di hemleyê de cih digirin, ji eşîrên herêmê pêk tên û diyar kir ku heta niha 2 hezar ciwanên li herêmê tevli hêzên wan bûne. Hivêdlî got ku ew ê di demekê nêzde mizgîniya rizgarkirina Reqqayê bidin gelên xwe. Berdevka Fermî ya Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê Cîhan Şêx Ehmed jî anî ziman ku hemleya wan bi pêşengiya jinê destpêkiriye û di vê çarçoveyê de bi hezaran jin hatine rizgarkirin. Berdevkê Fermî yê HSD'ê Mîralayî Telal Silo jî destnîşan kir ku baweriya gel bi hêzên wan heye û spasiya gelên herêmê kir. REQQA - ANHA

## 15 çeteyên êrîşkar hatin kuştin

Komên çete yên DAIŞ'ê êrîşî çeperên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê yên li gundên Til Semin û Siwêdiya Rojhilat kirin. Di encama bersivandina şervanan de 15 çete hatin kuştin û êrîşa çeteyan hat şikandin.

Li gorî agahiyên ji herêmê, çeteyên DAIŞ'ê di sibeha 17'ê çileyê de êrîşî çeperên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê yên li bajaroka Til Semin û gundê Siwêdiya Rojhilat kirin. Di encama bersivdayîna şervanan de li herêmê pevçûnên dijwar qewimîn. Di encama pevçûnên dijwar de êrîşa çeteyan hat şikandin û 15 çete hatin kuştin. Her wiha balafirên koalîsyonê jî gelek wesayîtên çeteyan rûxandin.

Li gorî agahiyên ji Minbicê, artêşa tirk a dagirker bajaroka Arîma, gundên Mehsenlî û Ereb Hesen ên Minbicê topbaran kir. Hat zanîn ku di encama topbaranê de gelek ziyanên madî pêk hatin û welatiyên herêmê ji gundên xwe koçber dibin. Hat ragihandin ku heta niha 2 zêdetirî 5 hewanan li navenda Arîma yê ketine.

YPG'ê jî bi daxuyaniyekê êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî Rojava ragihandin û ev tişt parvekirin: "Artêşa tirk di 16'ê çileyê de sînorê Bobanê yê Kobanê derbas kir û piştre jî dîwar avakirin. Di heman rojê de bi topên hewanê êrîşî Mervanê yê Şiye ya Efrînê kirin. Her wiha balafirên keşfê yên bêmirov jî li ser Girê Iska yê Cindirês a Efrînê geriyan.Komên çete yên Tirkiyeyê jî bi topên hewanê êrîşî gundê Eyn Deqnê kirin." *REQQA - ANHA*

## Xezeba Firatê gelên herêmê kirin yek

NÛRHAN EBDÎ / REQQA - ANHA

Rûspiyên eşîrên Reqqayê anîn ziman ku bi Xezeba Firatê hemû ol, hêz û bi têkoşîna hevpar bûne yek.

Têkildarî mijarê de rûspiyê eşîra El Henadî yê bi navê Şêx Îbrehîm Îsa El Hindawî destnîşan kir ku bi eşîrên din re yekitiya xwe avakirine û wiha dom kir: "Tirkiyeyê demek berê bi rûspiyên herêmê re civiya û xwest ku hemleyê vala derxînin. Me jî bi yekitiya xwe ev hewldan têk bir. Em ê piştî Reqqayê jî biçin Dêra Zorê."

Rûspiyê eşîra Bûesaf ê bi navê Şêx Celal Mehmûd El Eyaf jî bilêv kir ku hemleyê hemû eşîr û pêkhate kirin yek û got ku Tirkiye li Tebqayê bi darê zorê bi eşîran re civiyaye.

Şêxê eşîra El Bû yê bi navê Esaf Ubêd Xelîl Xelef El Esaf, şêxê eşîra El Tey ê bi navê Ehemed El Seyda û şêxê eşîra El Begera yê bi navê Fewaz El Begarî jî dan zanîn ku bi serkeftinên şervanan baregehên çeteyan hildiweşin û piştgiriya bi şervanan re erka hemû eşîrane. Serokeşîran dan daxuyandin ku ew ê piştgirî bidin hemleyê.

## Li Şehbayê Dîwana Dadê hate vekirin





Dîwana Dada Civakî ya herêma Şehbayê navenda xwe li bajaroka Arfadê (Til Rifet) vekir.

Bi armanca vekirina Dîwana Dadê ya herêma Şehbayê, Meclisa Rêveberiya Şehbayê civînek li dar xist. Di encama civînê de navenda Dîwana Dadê li Arfadê bi merasîmekê hat vekirin. Di merasîmê de Nûnerên Rêveberiya Xweser, Meclisa Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê, Meclisa Rûspiyên Şehbayê, Hevbendiya Niştîmanî ya Demokratîk a Sûriyeyê û Dîwana Dada Civakî ya Efrînê amade bûn.

Di axaftinên merasîmê de navend li hemû gelan hat pîrozkirin û hat destnîşankirin ku dê rola navendê di çareserkirina dozên gel û pêşxistina dada civakî de cihekê baş bigre. Axaftvanan bilêvkirin ku Dîwana Dada Civakî dikare nirxên civakê biparêze û jiyana hevbeş hîn xurtir bike. Deriyê navendê ji hêla dayika şehîd Roj ve hate vekirin. Navend ji komîteyên lêpirsîn, dîwan û rêveberiya giştî pêk tê û 8 endam tê de di xebitin. EFRÎN - ANHA

## Artêşa tirk heta niha 332 sivîl qetil kirine

Saziya Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyeyê di rapora xwe de destnîşan kir ku di encama êrîşên Tirkiyeyê yên li bakurê Sûriyeyê de 332 sivîl hatine qetilkirin.

Encamên dagirkerî û êrîşên artêşa tirk a dagirker ên li bakurê Sûriyeyê her ku diçe bi belgeyên cuda tên parvekirin. Çavderiya Mafên Mirovan a Sûriyeyê rapora xwe ya dawî de diyar kir ku ji 24'ê tebaxa 2016'an heta niha Tirkiyeyê 332 sivîl qetilkirine.

**2 HEZAR Û 300 SIVÎL BIRÎNDAR BÛNE**

Di rapora çavderiyê de hat diyarkirin ku ji destpêka dagirkeriya Tirkiyeyê heta niha 76 jê zarok bi giştî 332 sivîl hatine qetilkirin. Di berdewama raporê de jî ev agahî hatin parvekirin: "Piştî ku hêzên artÊşa tirk a dagirker derbeyên giran xwarin, êrîşên xwe zêde kirin. Di encamê de 2 hezar û 300 sivîl birîndar bûn û gelek ji van kesan astengdar bûne."

**BÊDENGIYA CÎHANÊ**

Di dawiyê de jî çavderiyê ev tişt ragihandin: "Ji ber topbarana artêşa tirk gelek avahiyên sivîlan, navendên saziyan û hwd hatine rûxandin. Di encama topbaran û bombebaranê de jî 27 hezar sivîl ji bakurê Sûriyeyê koçber bûn. Tevî vê yekê jî dewletên navneteweyî li dijî van komkujiyan bêdeng mane." QAMIŞLO - ANHA



## Dê li Helebê fedaralî bê nîqaşkirin

Serokê Meclisa Hevbeş a taxa Şêxmeqsûd Mirî El Şiblî anî ziman ku meclisa wan ji hemû gelên li taxê pêk tê û da zanîn ku avakirina meclisê rolekî girîng di civakê de lîstiye. El Şiblî ev nirxandin kir: "Meclisê karî ku hemû gelan li ser rêgezên jiyana hevbeş û biratiya gelan bicivîne. Dê demekê pêşde konferansa me dê bê lidarxistin û hemû gel dê tevli bibin. Konferans nîşaneya çareseriya pirsgirêkane. Em ê di konferansê de mekanîzmaya pêkanîna federaliya demokratîk jî nîqaş bikin." HELEB



## Tirkiye dijminê darên zeytûnan e

Hêzên artêşa tirk a dagirker bi wesayîtên xwe yên zirxî sînorê di navbera bakurê Kurdistanê û Kantona Efrînê de derbaskirin û darên zeytûnan rakirin. Welatiyên li herêmê diyar kirin ku leşkerên artêşa tirk darên zeytûnan ên gundên Ereb Cuma yê Şerayê rakirine. Hêjayî bibîrxistinê ye ku hêzên artêşa tirk ji 11'ê kanûnê heta niha 250 metre derbasî gundê Ereb Cuma bûne. Welatiyan gotin ku leşker bi kepçe û dozeran li ser sînor bi cih bûne û darên zeytûnan radikin. Welatiyan anîn ziman ku li Gundê Qermetleq ê Şiyê jî 60 metre sînor derbas kirine û darên zeytûnan radikin. EFRÎN



## Êdî zarokên koçber nacemidin

Bi hatina demsala zivistanê li Kantona Efrînê derfetên madeyên germkirinê kêm bûne. Vê yekê jî bandoreke neyînî li ser rewşa koçberan kir. Di çarçoveya xebatên piştgirî û piştevaniya bi welatiyên koçber re Buroya Karûbarê Koçberan ya girêdayî Destaya Karûbarê Civakî, 282 sobe û 605 kîsên bemahiyê zêytûnan (Bêrîn) li koçberên kampa Rûbar belav kirin. Li her malbateke koçberan sobeyek û turekî bêrînê hate belavkirin. Li kampa Rûbar 498 malbat dimînin û piraniya wan jî zarokin. EFRÎN



## Dê kongreya PYD'ê di çileyê de li dar bixin

Bi armanca nirxandina rewşa dawî û nîqaşkirina xebatên rêxitinî, rêxistina Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) a Amûdê civînek lidar xist. Di civînê de biryara lidarxistina 2'yemîn kongreya PYD'ê ya Amûdê di dawiyê çileyê de hat girtin. Di civînê de civîna Astanayê hat nirxandin û hat destnîşankirin ku ji ber ku nûnerên gelên Sûriyeyê tevli civînê nabin, serkeftina wê jî ne pekane. Di civînê de rewşa rêxistinî ya PYD'ê jî hat nirxandin û biryarên girîng hatin girtin. AMÛDÊ

## Hejmara komunên xwe zêde dikin

Şêniyên Tirbespiyê ji bo ku xebatên civakî baştir bi rêxistin bikin, hejmara komunên xwe zêde dikin û hejmara malan di nava komunan de kêm dikin. Bi armanca meşandina van xebatan jî komîteyeke taybet ava kirine. Ji 2015'an heta niha bi sedan komun hatine avakirin. Di vê komîteyê de jî nûnerên TEV-DEM, Kongreya Star, YCR, partiyên siyasî û rêxistinên civakî cih digirin. Endamên komîteyê dan zanîn ku piştî şêniyan girîngiya komunan û rola wê dîtin, daxwaz dikin ku hejmara komunan were zêdekirin. TIRBESPIYÊ

## Komîteya çalakiyên 8'ê Adarê ava kirin

Kongreya Star di çarçoveya xebatên amadekariya çalakiyên 8'ê Adarê de bi tevlibûna nûnerên jin ên hemû sazî û dezgehên Kantona Cizîrê civînek li dar xist. Civîn bi rêzgirtinê destpê kir û piştre jî di çarçoveya xebatên çalakiyên 8'ê Adarê ku dê bêne lidarxistin, hate nîqaşkirin. Di encama nîqaşan de komîteyek amadekar ku ji 12 jinan pêk tê, hat avakirin. Di civînê de biryar hate giritin ku amadekarî ji 1'ê sibata 2017'an de bi awayekî fermî bên destpêkirin. QAMIŞLO

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
18 Çile 2017 Çarşem

## Qeyûm tayînî Bêgiriyê kirin

**WAN** – Piştî Hevşaredar Mehmet Alî Tunç duh hat binçavkirin qeyûm tayînî Şaredariya Bêgiriyê hat kirin. Qeymeqamê navçeyê Mehmet Fatîh Çelîkel wekî qayûm tayînî Şaredariya navçeya Bêgiriyê ya Wanê hat kirin. Polîsên ku di saetên nîvro de hatin şaredariyê, diyar kir ku qeyûm tayînî şaredariyê hatiye kirin û lêgerîn pêk anîn. Hevşaredar Tunç û 16 kesên di 13'yê Çileyê de hatibûn binçavkirin li Midûriyeta Polîsan a Bajar tên ragirtin.



## Qeyûm dîsa ji kar derxistin

**ŞIRNEX** – Li navçeya Cizîrê ya Şirnex qeyûm bêyî ku hincet nîşan bide 11 karker ji şaredariyê derxistin. Di nav xebatkarên hatine derxistin de xwîşka endamê SES'ê Aziz Yural ê ku di qedexeya 14'ê kanûnê de hatibû îlankirin jiyana xwe ji dest da Rojîn Yural jî heye. Navên xebatkarên hatine derxistin wiha ne: Rojîn Yural, Yasemîn Înanç, Şukriye Çeter, Zeynep Acet, Cengîz Oglagi, Alî Ustun, Alî Bayar û Servet Sansak.

## 'Bila endamên me serbest berdin'

(BES) a Îzmîrê, ji bo hevalên wan ên ji KHK'yên ku di OHAL'ê de hatine derxistin hatine îxraçkirin û pêkanîna binçavakirina endamên wan ên li dadgehê şermezar bikin civîneke çapemeniyê li dar xist. Di civînê de Serokê BES'a Îzmîrê Musa Sever, axivî. Sever diyar kir ku bi KHK'yan bê lêpirsîn, bêhiqûqî û bi pêkanînên keyfî 23 rêveber û endamên wan hatine îxraçkirin. Sever xwest endamên wan ên bi kêfî hatine binçavkirin bila serbest bên berdan.




# Piştî 24 rojan sewq kirin

**6 rojnamegerên ku 24 roj in di bin çavan de bûn sewqî edliyeyê hatin kirin. Rojnamegerên ku ji bo piştgiriyê hatin cem edliyeya Stenbolê, diyar kir ku ew ê hevalên xwe bigirin û biçin**




Di 25'ê Kanûna 2016'an de Midûrê DÎHA'yê Omer Çelîk û nûçegihan Metîn Yoksu, Midûra Berpirsyar a ETHA'yê Derya Okatan, Midûrê Karên Nivîsan ê Rojnameya Yolculuk Eray Sargin, edîtora Dîkenê Tunca Ogreten û xebatkarê rojnameya Bîrgunê Mahîr Kanaat, hatin binçavkirin û piştî roja 24'an sewqî dozgeriyê hatin kirin.

Rojnamegerên sewqî dadgeha Stenbolê ya li Çaglayane hatin kirin, îfadeya wan didome. Rojnamegerên ku ji ber derbarê maîlên Berat Albayrak de nûçe çêkirine û di 25'ê Kanûnê de hatin binçavkirin li edliyeyê ne. Li aliyê din hempîşeyên 6 rojnamegeran ji bo piştgiriyê li ber edliyeyê kom bûn û li vir daxuyanî da.

Di daxuyaniyê de Serokê Giştî yê DÎSK Basın Îşê Faruk Eren, Endam û rêveberên ESP, SKM, Sendîkaya Rojnamegerên Tirkiye (TGS) xizmên rojnamegerên di bin çavan de û hempîşeyên wan amade bûn. Di daxuyaniyê de pankarta ku wêneyê 6 rojnamegeran li ser bû û nivîsa "Ji Rojnamegeran re azadî" lê heye hat vekirin. Koma rojnamegeran di daxuyaniyê de sloganên "Çapemeniya azad nayê bêdengkirin" û "Bila rojnamegerên di bin çavan de serbest bên berdan." berz kirin.

Li ser navê rojnamegeran edîtora ETHA'yê Arzu Demir, diyar kir ku îdiaya der barê rojnamegerên di bin çavan de hemû rojnamegeran eleqedar dike û wiha got: "Em hêvî dikin ku hevalên me yên rojnameger dê serbest bên berdan û hiqûq dê pêk bê. Nûçegihana DÎHA'yê ya Stenbolê ku bi KHK'ê hat girtin Necla Demir anî ziman ku bi armanca piştevaniyê hatine vir û wiha got: "Bi salan ez li gel Metin Yoksu û Omer Çelik bi hev re xebitîm. Em nizanin ku dê îro bê berdan a na. Lê em hevî dikin ku serbest bên berdan."

Endamê Lijneya Weşanê ya rojnameya BirGunê Barış Înce jî anî ziman ku binçavkirina ku bêyî sucdarî diyar be îşkence ye û wiha got: "Em dixwazin hevalên me zû serbest bên berdan. Heta em hevalên xwe ji vir negirin em naçin. Em dê hevalên xwe bigirin û biçin."

Rojnameger Mehveş Evin jî anî ziman ku ji bo ku dengê xwe bilind bikin li vir in û got: "Mesele mafê civakê yê azadiya agahiyan e. Divê tu tişt mafê civakê yê azadiya agahiyan asteng neke. Em dê ji bo vî mafê xwe li vir bin. Rêveberê TGS'ê Can Ugur û Serokê DİSK Basın-İşê Faruk Eren jî anî ziman ku binçavkirina 24 rojan îşkence ye û xwestin serbest bên berdan. ***STENBOL***

# Derqanûnî hatine guhdarkirin

Di îdianameya der barê Parlementera HDP'ê ya Amedê Nursel Aydogan a bi daxwaza 103 sal cezayê girtîgehê hat amadekirin de, derketibû holê ku di Civîna Lijneya Giştî ya Awarte ya KCD'ê ya li avahiya BDP'a Amedê ya di 14'ê Tîrmeha 2011'an de hat girtin de, axaftinên parlementeran ji aliyê polîsan ve hatine guhdarîkirin û hatine tomarkirin. Piştî di îdianameyê de guhdarîkirin derket holê, bû cihê nîqaşan.

Parêzer Reyhan Yalçindag destnîşan kir ku parlamenter bi bêriyî hatine guhdarîkirin û her wiha guhdarîkirina wan a bi biryara dadgerên ji peywirê hatine îxrackirin jî skandaleke huqûqî ye. Yalçindag balê kişand ser îdianameya der barê Parlementera HDP'î Aydoganê de hatiye amadekirin û wiha dest nîşan kir: "Diyar bû ku dê derhuqûqiya 7 sal berê hat kirin derkeve pêşberî me. Di serî de Lijneya Giştî ya Meclîsê, ji bo tu axaftinan der barê parlementeran doz nayê vekirin." ***AMED - DÎHABER***




# 16 kes hatin binçaçkirin

Li Sêrt û Wanê 16 kes hatin binçavkirin. Di serdegirtina malan a li dijî xwendekarên Zanîngeha Yuzuncu Yila Wanê de 5 xwendekar hatin binçavkirin. Li navçeya Misirc a Sêrtê polîsan bi ser malan de girtin gelek kes hatin binçavkirin. Navê kesên hatine binçavkirin wiha ne: şaredarê berê yê Misircê Necat Yilmaz, Hasan Yilmaz, Fîkrî Orenç, Necîbe Çelîk, Kemal Bîngol, Huseyîn Sezgîn, Cahît Yoltay, Berîvan Orenç, Ahmet Çelîk, Zekî Yilmaz û welatiyekê navê wî ne hat zanîn. Li navçeya Qereçobana Erziromê xwendekarê bi navê Omer Ugur hat girtin. ***AMED***

## Şilêr

# Şengalo "pir xwediyo"



Gulê Algunerhan
@AlgunerhanGulee

Êzidî rastî 73 fermanan hatine. Herî dawî di dema desthilatdariya Seddam de di bin navê "Enfalê" de 2 ferman di ser serê wan re derbas bûn. Di sala 2007'an de jî li Şengalê êrîşeke bombeyî pêk hatibû û bêtirî 500 kesî jiyana xwe ji dest dabû. Ji dema osmaniyan hetanî niha êzidî her tim bi fermanan re rû bi rû man û her tim bi tirsa fermaneke din jiyan. Êzidiyên ku di nava kurdan de wek "kurdên resen" tên binavkirin tu carî nebûn xwedî nasname û statu. Hem bûn hedefa êrişên dagirkerên Kurdistanê hem jî ji hêla partî û rêxistinên 'kurdan' ve tim di plana duyemîn de hatin hiştin. Çi êzidiyên li Şengal û Şêxanê bin, çi jî yên li Bakur û Rojavayê welêt bin ji bo xwe ji êrîşên derve û navxweyî biparêzin, neçar man xwe ji civat û cîhana derve re bigirin. Lewma dengê wan zêde nehate bihîstin.

Li ser wan gelek siyaset hat kirin, êzidiyên ku nedihatin bîra partiyan di demên hilbijartinan de li ber dilê wan şîrîn bûn û ev siyaset, bi taybetî jî li ser Şengalê dihat meşandin. Tevî ku siyaseta li Iraqê di sala 2004'an de bi giştî hat guhertin jî wekî Kerkûk, Xaneqîn û Mendelînê, Şengal jî li ser axa başûrê Kurdistanê nehat hesibandin. Di sala 2007'an de xala 140'an a ku statuya Şengalê bi referandûmê diyar dike di destûra bingehîn a Iraqê de hat qebûlkirin. Lê, ew referandûma qalkirî jî pêk nehat û ev yek tim hat astengkirin. Nehiştin Şengal bibe xwedî statu, wê demê kes xwedî li Şengalê derneket. Dek, dolab û hesabên dûrî exlaq û mirovahiyê li ser Şengalê hatin kirin. Hesabên hatin kirin di havîna 2014'an de xwe dan der.

Dema çeteyên hov ên DAIŞ'ê di 10'ê hezîrana 2014'an de Mûsil dagir kir, bêgûman berê awiran zivirî ser Şengalê. Jixwe wisa jî bû. Di dawiya meha tîrmehê de çeteyên DAIŞ'ê berê xwe da gundên Şengalê. Li dijî van êrîşan jî gundî li gorî mecalên xwe bi çek bûn û parastina gundên xwe kir.

*Û 3'yê tebaxa 2014'an...*

Çeteyên DAIŞ'ê Şengal dagir kir. Ferman û qirkirina herî hovane li ber çavê dinyayê pêk hat. Çeteyên hov ên para xwe ji insaniyetê negirtiye, bi hevkariya hêzên navneteweyî û herêmî paçên reş ên qetranî bi ser Şengalê de kirin. Mixabin, êzidî bi vê êrişê re rû bi rûyî qirkirina herî mezin a dîroka xwe hatin. Li gorî daneyên ji herêmê; di vê fermanê de 300 jê zarok bêtirî 3 hezar û 500 sîvîlan jiyana xwe ji dest da. Tevî jin û zarokên hatin revandin bi giştî bêtirî 5 hezar kes jî winda ne. Tê gotin, di vê fermanê de zêdetirî 10 hezar windahiyên Şengalê hene. Heke şervanên YPG/YPJ û siwarên HPG/YJA-STAR'ê nebûna gelo encama vê karesatê çawa dibû? Gelo niha Şengal di bin dagirkeriya kê de bû? Axir, mirov qet naxwaze wan tiştan bîne ber çavê xwe jî. Ji roja fermanê heya niha 230 şervanên azadiyê di oxira Şengala azad de şehîd şûn. Piştî fermanê çavê her kesî li Şengalê bû, bê ka wê aqûbeta Şengalê çi be û ew ê çawa ji bin vê fermanê rabe? Şervanên azadiyê ev hesabên gemarî yên li ser Şengalê pûç kirin. Şengal bi berxwedana Derwêş û Edûleyên xwe yên hemdem li ser piyan ma. Şengalê berdêlên giran dan, bi wan hovên çeteyan re rû bi rû hat hiştin lê ji wan re nebû yar. Birîna Şengalê gelekî kûr û giran bû ku bi dehan salan nikare bê kewandin. Lê belê bi wê fermanê re şengalî û êzidiyan qeyd û bendên tirsê şikandin. Bi wê fermanê re bi qawet û îradeya xwe û bi pêşengiya şervanên xwe, xwe li ser pêyan girt û sîstema xwe ya rêxistinî ava kir. Sal 2014 û niha sal 2017, yên berê Şengal dîtîbû dema piştî fermanê diçin ji ber rêxistinbûn, îradebûn û îdeolojîkbûna êzidiyan matmayî dimînin. Civakeke ku birîna wê ew qas kûr e, li şûna şîna daîmî, bi birêxistinbûn û pêşketineke mezin bersiv da êrîşan. Niha tevî hemû ambargo û zehmetiyên jiyanî Şengal xwe diparêze, xwe îdare dike û jinên wê jî pêşengiya wê sîstemê dikin.

***Berê nedihat bîra kesî, lê niha xwazgîniyên wê pir in***

Ew ên neditirsiyan û nedigotin êzidî bê parastin û bê rêxistinî ne niha Şengal û Êzidxan li ber dilê xwe şîrîn kirine. Piştî ew qas êşa giran hê jî li ser Şengalê hesab tên kirin. Berê Şengal nedihat bîra kesî lê niha xwazgîniyên wê pir in. Her kes li ser Şengalê diaxive, her kes li ser gelê li wê derê gotinan dibêje, lê kes nabêje bê ka ew çi dixwazin û çi dibêjin? Dewleta tirk û hevalbendên wê bi tirs û xof in ku "Şengal bibe Qendîla duyemîn", dibe ku ev yek di aliyê erdnîgariyê de ne mimkun be lê tişta zelal ew e ku ji roja ewil a fermanê ve di dilê hemû şengaliyan de Qendîl ava bûye. Niha li çiyayê Şengalê 20 hezar welatî û tevî vegerên li gundên wê jî bi giştî 50-60 hezar kes hene. Eger hûn mîkrofonên xwe bigirin û herin nav wan şengaliyan hûn ê bi yek dengî bibihîzin ku ew hebûna gerîlayan a li wê derê wekî garantiya statuya Şengalê dibînin. Jixwe li milê Rojhilatê çiyê pêşmerge, li aliyê rojava gerîla û şervanên YBŞ'ê û li qada navîn jî gerîla û pêşmerge bi hev re ne. Piraniya pêşmergeyên li wê derê jî êzidî ne. Miletê li wê derê naxwaze PKK ji wir derkeve û naxwaze di navbera partiyên kurd de alozî derkeve. Ev yek ne tenê daxwaza şengaliyan e, daxwaza hemû kurdan e. Lewma madem xwazgîniyên Şengalê ew qas pir bûne û hemû lê xwedî derdikevin wê çaxê çima guh nadin daxwazên şengaliyan? Ma ne ya girîng daxwaza wan e? Ma ne ya girîng azadiya Şengalê ye?

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
18 Çile 2017 Çarşem

# Astana jî dê mîna CENEVREYÊ TÊK BIÇE

*Endama Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Foza Yûsif têkildarî bertekên hêzên herêmê û yên navneteweyî yên der barê federaliya demokratîk de xebatên wan yên ji bo danasîna federaliya demokratîk, bandora pêşketinên leşkerî yên li ser siyaseta Rojava, gef û êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî bakurê Sûriyeyê, hevdîtinên hin kesên nêzî ENKS'ê yên bi hêzên rejîmê re û asta tevlîbûna jinan a di pergala federaliya demokratîk de pirsên rojnameya me bersivandin. Foza Yûsif da zanîn ku heta niha rastî tu bertekên neyînî ji derveyî Tirkiyeyê nehatine û da zanîn ku dê di encama êrîşeke îxtîmalî ya Tirkiyeyê de her qadeke Rojava bibe Kobanêya duyemîn. Foza Yûsif got ku federaliya demokratîk bi hemû taybetiyên xwe wekî pergala jinan e.*



SERDAR UREK – BIŞAR DURGUT / QAMIŞLO

Endama Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Foza Yûsif diyar kir ku di civîna Astanayê de nûnerên gelên

**Sûriyeyê tune ne û ji ber vê jî şansê serkeftina Astanayê tune ye**

**Di civîna duyemîn a meclisa damezirîner de hevpeymana civakî hat erêkirin û ji bo çareseriya Sûriyeyê jî belgeya siyasî hat diyarkirin. Gelo piştî erêkirina hevpeymana civakî û belgeya siyasî hûn hem li hundir û hem jî li derve rastî bertekên çawa hatin?**

Bêguman ev demek e ku em projeya federaliya demokratîk guftûgo dikin. Ji bo danasîn û dayîna fêmkirinê me gelek xebat meşandin. Di vê çarçoveyê de ez dikarim bibêjim ku sê cureyên bertekan derketin pêş. Ya yekemîn; pêkhateyên herêma bakurê Sûriyeyê gelek baş pêşwazî kirin. Ji ber ku ev cara yekemîn e ku gel li hev dicivin û jiyana xwe li gorî vîna xwe bi rêxistin dikin. Ji bo gelan şoreşeke civakî ye û bi heyecaneke mezin tê peşwazîkirin. Li gorî agahiyên di destê me de gelên din ên Sûriyeyê jî bi kelecan û heyecaneke mezin nêzî projeya me dibin. Projeya me ji bo xwe wek mînaka rizgariyê dibînin. Berteka duyemîn jî ya partiyên siyasî ên li Sûriyeyê û derve ne ku ji tirsa rejîm û dewletên pê ve girêdayî tev digerin. Bi awayekî şermînok dibêjin çareseriyeke yekalî ye û parçekirina Sûriyeyê esas digire. Berteka sêyemîn jî ya hin hêzên şovenîst ên partiyên ereb û hin derdorên bi wan ve girêdayî ne. Ev hêz jî dibêjin ku divê tu guhertin çênebin û di serî de kurd, tu pêkhate nebin xwedî statûyeke siyasî û dixwazin netewedewleta xwe biparêzin. Lê em dema ku li gelemperiya nêrînan dinêrin, dikarin bibêjin ku projeya me ji bo hemû gelan, jinan û ciwanan hêviyeke mezin afirandiye. Piştî du sed salan cara yekem e ku pêkhateyên herêmê bi hev re çarenûsa vîna xwe diyar dikin. Ev jî ji bo serkeftinê xaleke girîng e.

**Tevî van geşedanên siyasî yên li herêmê, her wiha pêşketinên cidî yên leşkerî jî hene. Hêzên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê di çarçoveya Hemleya Xezeba Firatê de qadeke berfireh rizgar kir. Gelo ev pêşketinên leşkerî bandoreke çawa li ser siyaseta bakurê Sûriyeyê dikin?**

Her pêşketineke leşkerî pêşî li pêşketineke siyasî vedike. Bi pêşketinên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) re qadeke mezin ji çeteyên DAIŞ'ê tê rizgarkirin û ev herêmên di bin dagirkeriyê de vediguherin qadên ewle. Ewlehî jî ji bo serkeftina vê projeyê gelekî girîng e. Bi rizgarkirina qadên nû tevlîbûna civak û qadên nû li nava projeya me vedike. Azadkirina van qadan ji çeteyên DAIŞ'ê baweriyeke mezin di gelên herêmê de çêdike. Ev hêz, hêzeke demokratîk e û ji bo azadiya gelan e. Ev yek jî dibe sedem ku gelên herêmê pêşeroja xwe di neteweya demokratîk de bibînin û baweriya bi HSD'ê zêde dibe.

**Tevî operasyona Xezeba Firatê, Tirkiye jî gefên wekî 'Dê bikevin Girê Spî, dê êrîşî Minbic, Efrîn û hwd. bikin' dike. Gelo hûn van gef û êrîşên Tirkiyeyê çawa dinirxînin?**

Tirkiye li Sûriyeyê di aliyê stratejîk de têk çû. Erdogan digot; 'Em ê li Mizgefta Emewiyê nimêjê bikin.' Lê tevî ku ev 4 meh e dixwaze Babê dagir bike jî nikare yek pêngav pêşve biavêje. Li Helebê rastî têkçûneke dijwar hatin û her tiştê xwe radestî rejîm û Rûsyayê kirin. Tirkiye dixwaze vê têkçûna xwe bi êrîşkirin û gefxwarinên li dijî rojavayê Kurdistanê veşêre. Lewma jî ji bo têkbirina kurdan her tiştê xwe difiroşe. Dibe ku êrîş bike lê ez dibêjim ku dê bi êrîşa xwe, xwe bi xwe, xwe bikuje. Ji ber ku kurd ne kurdên sedsala 20'emîn in. Lewma jî heke êrîş çêbe, dê rastî berxwedana sedsalî were. Dê her devereke Rojava bibe Kobanê û dê Rojava û Bakur bibe yek. Ev yek jî dê rê li ber parçebûna Tirkiyeyê veke.

**Tirkiye ji bo pêşîlêgirtina projeya federaliya demokratîk di nava hewldanên cidî de ye. Gelo hûn dikarin hinekî hewldanên Tirkiyeyê ji me re parve bikin?**

Tirkiye hem bi rêyên leşkerî û hem jî bi rêyên dîplomatîk dixwaze rê li ber gavên me bigire. Ketina wan a Cerablus, Ezaz û şerê li Babê bi vê boneyê tê kirin. Her wiha ji bo pêşîlêgirtina tevlîbûna nûnerên Rojava di civîna Astanayê de jî xebatên dîplomatîk dimeşîne. Lê ez bi zelalî dibêjim ku Tirkiye çi dike bila bike dê hewldanên wê hemû jî vala derkevin û dê nekare pêşiya meşa me bigire.

**Ji bo çareseriya aloziya Sûriyeyê rêzecivînên Cenevre 1, 2, 3 hatin lidarxistin û tevî ku hûn wek hêza herî demokratîk a li Sûriyeyê ne jî, nehatin vexwendin. Lê ev civîn têk çûn û niha jî bi tevlîbûna Rûsya, Îran û Tirkiyeyê tê payîn ku dê di 23'ê çileyê de li Astanayê civînek bê lidarxistin. Gelo li gorî we Astana dê çareseriyekê bi xwe re bîne?**

Li gorî me civîna dê li Astanayê were lidarxistin jî mîna civînên Cenevre 1, 2, 3 ne xwedî projeyeke çareseriya ji bo tevahiya Sûriyeyê be. Tu hêzên peywendîdar ên ku nûnertiya vîna gelên Sûriyeyê dikin, nehatine vexwendin. Bi taybet jî vîna siyasî ya Rojava û bakurê Sûriyeyê nehatine vexwendin. Mijareke herî girîng jî ew e ku ne rejîma Sûriyeyê û ne jî hêzên koalîsyona Sûriyeyê, xwedî vîneke siyasî nîn in. Di civîna Astanayê de qaşo rejîm û koalîsyona Sûriyeyê muzakere nakin. Di rastiyê de dê Rûsya û Tirkiye muzakereyan bikin. Ji ber ku Heleb ne rejîmê, Rûsyayê rizgar kir. Her wiha Artêşa Azad xwe venekişand, bi talîmata Tirkiyeyê ji Helebê derket. Ji ber vê yekê jî ger di muzakereyan de vîneke siyasî nebe, ne mimkûn e ku çareseriyek derkeve. Her wiha mijareke din a girîng jî ew e ku hêzên li Astanayê li hev dicivin, di aliyê stratejîk de hemû jî dijberên hev in. Ango dibe ku ji bo demeke kurt li hev bikin. Lê ji bo demeke dirêj lihevkirina wan hinekî zehmet e. Şerê hegemonyayê yê di navbera Tirkiye û Îranê de yê li ser Rojhilata Navîn, dê bi lihevkirinên bi vî rengî bi dawî nebin. Her wiha ez bawer nakim ku hêzên koalîsyona navneteweyî û DYA destûrê bidin lihevkirineke ku ew tê de nebin. Ango em dema ku li gelemperiya rewşê dinêrin, şansê serkeftina vê civînê tune ye.

**Ji bo danasîn û qebûlkirina federaliya demokratîk hem li hundir, Rojhilata Navîn û hem jî li qada navneteweyî xebatên we di çi astê de ne?**

Bi armanca danasîna Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê me heta niha gelek civîn li dar xistin. Divê ev civînên danasînê hê jî berdewam bikin. Ji bo vê xebatê jî em hem li hundirê bakurê Sûriyeyê û hem jî li derveyî welat civîn, konferans û xebatên cuda li dar dixin. Ji ber ku hêz û kesên ku projeya neteweya demokratîk nas dikin, ne mimkûn e ku projeya me nepejirînin. Her wiha hemû xebaten dîplomasiyê jî bi van xebatên danasînê bi pêş dikevin.

**Di federaliya demokratîk de tevlîbûna jinan di çi astê de ye?**

Jin hêza bingehîn a pergala Federaliya Demokratîk in. Hem di avakirinê de û hem jî di hemû xebatên wê de jin xwedî roleke pêşeng in. Her wiha di hemû xalên hevpeymana civakî û federaliya demokratîk de jin hene. Mafê jinan di hevpeymana civakî û pergala nû de hatiye mîsogerkirin. Jin bi rêjeya ji sedî 50 ango bi qasî mêran di federaliyê de cih digirin. Hemû biryarên ku têkildarî jinan in, ji hêla jinan ve tên girtin. Dîsa sîstema hevserokatiyê di hemû saziyên pergala federaliya demokratîk de hîmê xwe girtiye. Ger em bibêjin pergala Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê pergala jinan e, dê ne şaş be. Ji ber ku jin di vê pergalê de bi her awayî xwedî maf in.

**Gelo ji bo pêvajoya piştî ku komên çete ji Sûriyeyê bên paqijkirin, der barê projeya Sûriyeyeke nû de danûstandinên we bi hêzên rejîmê re hene yan na?**

Heta niha tu hevdîtin di navbera nûnerên bakurê Sûriyeyê û hêzên rejîm û muxalefeta Sûriyeyê de çênebûne. Ji ber ku her her du hêz jî, dev ji federaliya demokratîk berde, hebûna gelê kurd û pêkhateyên din qebûl nakin. Em dikarin bibêjin ku heta niha tu daxwaz di vê mijarê de nîn in.

**Herî dawî hûn dixwazin çi lê zêde bikin?**

Bêguman gavên ku em diavêjin dê bi gelek zehmetiyan re rû bi rû bimînin. Lê ji bo serkeftina vê projeyê jî gelek derfetên dîrokî di destê me de hene. Tiştê herî girîng jî xwedî derketina hemû gelan li vê projeyê ye. Divê hêza parastinê xurt bikin, ji bo avakirin û pêşxistina projeyê bi vîn û israr têkoşîna xwe bidomînin. Gelên Mezopotamyayê gelek êş û azar kişandin. Êdî dema damezirandina jiyaneke layiqî vê ax û dîrokê hatiye. Her tişt ji bo ku em bi şoreşeke nû ruh bidin mirovahiyê têkoşînê li ser me ferz dike. Divê gelên bakurê Sûriyeyê di serî de kurd, suryan, ereb, tirkmen û ermen xwedî li vê rola xwe ya dîrokî derkevin. Ez vê pergalê li hemû gelan pîroz dikim û dibêjim ku serkeftin dê ya gelan be.



## Federalî bihûşta gelan e

**Tevlîbûn û nêrîna gelê herêmên rizgarkirî ya li hemberî federaliya demokratîk çawa ye?**

Heta niha li hemberî projeya me tu bertekeke neyînî nîn e. Her wiha di qada navneteweyî de jî ji derveyî Tirkiyeyê tu hêzên din bertek nîşan nedane. Ji ber ku projeya me hemû pêkhateyan digire nava xwe û ez di wê baweriyê de me ku dê di demeke kin de bê pejirandin. Bêguman ev pêvajo ew qas jî hêsan nabe lê em jî ji bo vê yekê amade ne. Ger em bi israr û xwedî vîn tev bigerin, niha hemû derfetên objektîf û subjektîf li aliyê me ne. Ji bo gelên herêmê ezmûna Rojava û projeya federaliya demokratîk mizgîniya bihareke nû ye. Lihevhatina gelan, ezmûna xweseriya demokratîk, dîsa şoreşa jinan û hevpeymana civakî ji bo hemû gelên herêmê diyariya jiyaneke nû diafirîne. Di nava çolê de mîna bihûştekê ye.

## Ev kes nikarin xwe jî temsîl bikin

**Hat îdiakirin ku hin kesên nêzî ENKS'ê, li Qamişlo û Şamê bi hêzên rejîm û Rûsyayê re hevdîtin pêk anîne. Gelo hûn van hewldanên rejîmê û Rûsyayê çawa dinirxînin?**

Di dema dawîn de hin kes çûne Şam û baregeha Himîmê û qaşo bi hêzên rejîm û Rûsyayê re muzakere kirine. Ev kes dest ji her tiştî berde nikarin nûnertiya xwe jî bikin. Ev kes mirovên rejîmê ne. Rejîm dixwaze bi vê yekê bide diyarkirin ku hin kurd bi wan re tev digerin. Her wiha dixwaze derveyî vîna siyasî ya heyî, van kesan bide pêş. Li gorî me ev lîstikên îstîxbarata Sûriyeyê ne. Rêbazeke klasîk e û hin kurdên klasîk û xulam bi wan re dilîzin. Ev kes xwedî tu giraniyeke siyasî nîn in û diyar e ku bi rêya pereyan û hin tiştên din ji bo xwe bi kar bînin. Beriya niha şandeyek ji rêveberiyên xweser û partiyên kurd ji bo muzakereyan hat diyarkirin. Ev şande muxatabê hemû muzakereyan e. Ji derveyî vê şandeyê tu kes li ser vîna gelên Rojava û bakurê Sûriyeyê nikare tev bigere. Di encama van lîstokan de ev kes tenê dibin amûrek û tevahiya îtîbara xwe ya siyasî û civakî winda dikin. Van lîstikan rejîm jî bike û Rûsya jî bike bi tu awayî dê nekarin encamekê bi dest bixin.

www.arsivakurdi.org

## Bi hezaran şagirtên Minbicê ketin ezmûnan

**67 HEZAR ŞAGIRTÊN** ku di 250 dibistanên bajarê Minbicê û gundên wê de dixwînin dest bi ezmûnên serdema yekem a sala xwendinê kir. Şagirtên ji hemû polan dê di beşên civaknasî, îgilîzî, fransî, erebî, fîzîk, kîmyayê de bikevin ezmûnan. Ji rêveberiya Dibistana el-Buhterî ya bajarê Minbicê Ibrahîm el- Ehmed destnîşan kir ku ezmûn bi awayekî serkeftî derbas dibin û got ku ezmûn dê di 19'ê çileyê de bi dawî bibin. **MINBIC**






## Dahata pêşangehê ji bo xwerêveberiyê ye

Komeleya Fransa-Kurdistanê li Parîsê pêşangeha wêneyan vekir. Dahata ji firotina tabloyan dê ji bo herêmên xwerêveberiyê yên li bakurê Kurdistanê were birêkirin. Di pêşangeha navborî ya ku li Espace Niemeyerê de 85 wênesaz bi 200 tabloyên xwe cih digirin. Pêşangeh li Espace Niemeyerê ye. Pêşangeh di 3'yê çileyê de hat vekirin û tabloyên tên pêşandan bi rêya mezatê dê bên firotin. Dahata tabloyan jî ew ê ji bo di oxira înşakirina bajarên bakurê Kurdistanê yên ji aliyê dewleta tirk ve hatin xerakirin de, bê serifandin. **PARÎS**





## Penaber ji bo windakiriyan nivîsand

Azad Penaber ku malbata wî di 1992'yan de ji Pirsûsê koçî Dîlokê kir, hêj 10 salî bû xwişka wî Gulistan a 21 salî di 2001'an de li Dîlokê di nava goristanê de bi 7 guleyan ji aliyê kesên nediyar ve hat kuştin û hêj kujerên wê diyar nebûne. Xizmê windayan Azad Penaber ê 25 salî yê xwişka wî hat kuştin û hêj faîl ne diyar in, li ser evîna windayan a nîvcomayî, hezkirina axê, zarokên penaber û hêrsa li dijî kujerên nediyar pirtûka helbestan nivîsand. Penaber pirtûka bi navê "Du Ziman û Evînek" ku ji 52 helbestan pêk tê ji Weşanxaneya Ceylan hezar pirtûk çap kirin û xist xizmeta hezkiriyên helbestan. **DÎLOK**



## Jinan li dijî Hollywoodê îsyan kir

Di wan salên dawîn de sektor û qada ku herî zêde ji ber zayendperestiyê rastî nerazîbûnê tê helbet sînema ye. Navnîşana bilanet a vê qadê jî Hollywood e. Patricia Arquette ya ku di axaftina xwe ya di xelatên Oscarê de got ku di qada sînemayê de wekheviya jin û mêran tune ye û Emma Stone ya di rêzefîlma 'La La Land'ê de rastî betekên erênî yên rexnegiran hat jî di nav de, gelek aktrîsan li dijî newekheviyê serî hilda. Aktrîs Reese Witherspoon a li dijî vê rewşa hanê tê, di hevpeyvînekê de got ku di fîlm û rêzefîlman de rola ku dikeve para jinan an hevser an jî xwişka mêran e û diyar kir ku kirasa ji bo jinan tê fesilandin ev e. Witherspoon destnîşan kir ku jin vê yekê qebûl nakin. **NEW YORK**



*Helbestvan ew kes in ku nêçîra peyvên herî xweş ên zimanê xwe dikin û wan peyvan dixin xizmeta gelê xwe. Yek ji wan nêçîrvanên jêhatî jî Bêbuhar bû ku beriya 4 salan konê xwe ji vê dinyayê bar kir*

# Gula bêbuharî wî bi bîr tîne

LUQMAN GULDIVÊ / BERLÎN

Helbestvan Yûsif Berazî bi navê hunermend Bêbuhar, yek ji şagirtên sereke yên Cegerxwîn bû û helbestên wî bi xêra hunermendên mîna Mihemed Şêxo û Seîd Gebarî li seranserê Kurdistanê belav bûn û tên nasîn. Bêbuhar di 8′emîn salvegera wefata xwe de li bajarê rojavayê Kurdistanê Serêkaniyê hat bibîranîn.

Yekitiya Rewşenbîran a Kantona Cizîrê helbestvanê kurd Yûsif Berazî bi navê xwe yê helbestvaniyê Bêbuhar, di 8′emîn salvegera wefata wî de bi bîr anî. Bêbuhar 15´ê çileya 2009´an li Serêkaniyê rehmet kiribû. Merasîma bîranînê li navenda Çand û Hunerê ya Waşokanî ya li bajarê Serêkaniyê bi beşdarbûna bi dehan rewşenbîr, helbestvan û kesayetên ji Kantona Cizîrê hat lidarxistin.

**MERASÎMA BÎRANÎNÊ**

Merasîma bîranînê bi rêzgirtinê dest pê kir û paşê li ser navê malbata helbestvan Bêbuhar, Azad Berazî axivî û malavayiya Yekitiya Rewşenbîran û hemû beşdaran kir. Di berdewama merasîmê de endamên çand û hunerê yên Serêkaniyê li ser jiyana Bêbuhar axivîn û jiyan û berhemên wî vegotin.

Paşê jî sînevîzyona li ser jiyan û berhemên wî hate nîşandan. Piştre dengbêj Mihemed Elî Şakir, hem Bêbuhar û hem jî hunermend Mihemed Şêxo bi vegotina awazên wî yên ji helbestên Bêbuhar, bi bîr anîn.

Helbestvana jin Enahêt Sîno jî helbesta "Heps û Zindan", helbestvan Tewfîq Silêman helbesta "Dikim fîxan ji derd û kula can û ceger" pêşkêş kirin. Her wiha Îbrahîm Şakir jî di salvegera bîranîna helbestvan Yûsiv Berazî de helbesta xwe ya bi navê "Bêbuhar" xwend û diyarî malbata wî kir.

**HUNERMENDÊ PIRALÎ**

Bêbuhar ne tenê di hunerekê de lê di gelek huneran de hoste bû. Helbestvanê ku di heman demê de stranbêj û hunermend jî bû, belkî herî zêde bi helbesta xwe ya "Hebs û Zindan" navdar e ku bi newa û dengê Mihemed Şêxo û bisqa wî hîna jî di guhên kurdî de olan dide. Bêbuhar ev helbesta hanê di zindaneke rejîma Sûriyeyê de li ser dîwarê hepsê nivîsiye.

Di rastiyê de ev helbest pêşî Mehmûd Ezîz Şakir kiriye stran û gotiye. Ji bilî vê helbestê ev helbestên han jî yên Bêbuhar in ku bi stranan gihaştine ber guhên gelê kurd: "Rabe ji xewê", gotin û awaz jî yên Bêbuhar in. "Şîn bû rihan", gotin û awaz jî yên Bêbuhar in. Dîsa "Eman dilo", "Gulîzar" jî gotin û awaz ên Bêbuhar in. "Dilê min her bi axîn e" gotin ên Bêbuhar in, awaz jî ya mamoste Mihemed Elî Şakir e. "Şêrîn tu cînara min î", gotin yên Bêbuhar in û awaz ya M. Elî Şakir e. "Koçê min bar kir", "Hat xweş buhar", "Bêbext felek" gotin yên Bêbuhar in û awaza her sêyan jî ya Seîd Gabarî ye.

## 'Ez helbestvanekî klasîk im'

**HELBESTVAN** Bêbuhar ji bo xwe gotiye, "ez helbestvanekî klasîk im" û di hevpeyvînekê de hin şîretan li nifşên nû yên nivîskar û helbestvanên kurd dike: "Berhemên kêm lê baş û giran ji berhemên zêde lê nizm û xirab baştir in. Guh bidin ziman, rênivîs û rêzimanê. Xwe bispêrin felsefeyeke taybet û rêbazeke zelal bişopînin û dîroka miletê xwe baş bixwînin."

Heçî fikra wî ya li ser helbestê ye jî, wî bi xwe bi kurtî wiha terîf dike: "Nûjenî qet nayê wateya nebûna kontrolê. Lê di dawiyê de, em nikarin dev ji muzîka helbestê berdin. Eger hat û muzîk di helbestê de nema, wê çaxê ew wek helbest namîne, lê dibe pexşan. Kesên ku nikarin helbesta klasîk binivîsin, nikarin helbesta nûjen jî binivîsin."

## Bêbuharê Kurdistanê



**HELBESTVAN** Yûsifê Berazî ku bi Bêbuhar navdar e, sala 1931´an li gundê Tilcircê yê nêzîkî navçeya Babê ya Helebê ji dayik bû û sala 1954´an li Serêkaniyê bi cih bû û heta dawiya emrê xwe jî li wir jiya.

Bêbuhar ji bilî helbestvaniya xwe, awazdaner, stranbêj û hunermend jî bû û 5 dîwanên helbestan li pey xwe hiştin. Gelek hunermendên navdar jî gotin û awazên wî kirin stran.

Ew wek yek ji helbestvanên klasîka kurdî yên dawîn li rojavayê Kurdistanê dihat hesibandin. Jixwe, ji bo wî tê gotin ku ji sala 1966´an heta 1979´an, çi helbesta dinivîsand, ji seydayê Cegerxwîn re dibir da ku Seyda wê sererast bike.

Ew ji eşîra beraziyan a deşta Pirsûsê/Sirûcê bû, ji ber vê yekê paşnavê xwe kiribû Berazî. Bêbuhar gelek awaz û gotin dane hunermendên navdar ên wekî Mehmûd Ezîz Şakir, Seîd Gabarî û Mihemed Şêxo û çend kesên din. Bi taybetî helbesta wî "Hebs û Zindan" deng veda ku wî li ser dîwarên zindanekê li Sûriyê nivîsandibû.

Pênc dîwanên ku Bêbuharî li pey xwe hiştin jî ev in: "Zindan, Bang, Raperîn, Serxwebûn û Pêşketin".

Bêbuhar 15´ê çileya 2009´an li bajarê Serêkaniyê koça dawîn kir û her li wê derê li axê hat spartin.

## TEV-ÇAND'ê li Esslingen civîn li dar xist



Komîsyonên çand û hunera kurdî yên di bin banê Navendên Civaka Demokratîk a Kurdan (NÇDK) ên li Herêma Başûrê Almanyayê de tevî Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Kurdî (TEV-ÇAND) li Esslingenê civînek li dar xist.

Civîn ji aliyê yek ji rêveberên TEV-ÇAND'ê hunermend Cewad Merwanî û endama komîsyona çand û hunerê Gulay Akdemîr ve hate birêvebirin. Di civînê de pirsgirêkên ku di qada çand û hunerê de hene û rêyên çareseriyê hatin nîqaşkirin. Dîsa di civînê de rewşa sazî û dezgehên çand û hunerê jî hat nirxandin û hat diyarkirin ku li herêma başûrê Almanyayê li gel ku 12 NÇDK hene jî ji ber ku mecliseke TEV-ÇAND'ê li herêmê tune ye, lazim e komîsyonên çand û hunerê bên cem hev û der barê xebatên pêşerojê de plansaziyê bikin. Hat xwestin ku nemaze jî jin û ciwan di nav xebatan de aktîf cih bigirin. **STUTTGART**

## Pirtûka kurdayetî û aloziya kesayetî hat çapkirin

Ji bo belavkirina nêrîna azad ku dikeve xizmeta civakê, Saziya Ronahî ya Ragihandinê û Belavkirinê dest bi çapkirina rêzepirtûkan kir. Ji van pirtûkan yekemîn pirtûka ku saziyê çap kiriye ya nivîskarê ku jiyana xwe ji dest daye Xelîl Kalo ye. Pirtûk bi navê 'Kurdeyatî û Aloziya Keseyatî' di sala 2007`an de hatiye nivîsandin.

Nivîskar Xelîl Kalo ji kesayetên welatparêz ên Kantona Cizîrê ye. Kalo di sala 1958`an de li gundê Dîrona Qelnikê yê Tirbespiyê ji dayik bû. Kalo bi mijarên ku dinivîsandin piraniya wan li ser civaka kurd û parastina nasnameya xwe dûrî şofîniyetî kiriye. Nivîskar pirtûka bi navê Mînakên Kurdî nivîsandiye û gelek pirtûkên bi zimanê kurdî wergerandine zimanê erebî. Nivîskar Xelîl Kalo Forûma Cegerxwîn a Çandî li herêma Aliyan ava kir û bi dehan semîner der barê çand û nasnameya kurdî de dane. **QAMIŞLO**



www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
18 Çele 2017 Çarşeme



# Tirkîya ver bi rijîyayîşî şona

**Endamê Akadamîya Îlmê Komelkî ya Abdullah Ocalanî Ozgur Denîzî derheqê krîzê sîyasî yo ke Tirkîya û Rojhelato Mîyanên de yeno cuyayîş de qisey kerd û wina va: "Tirkîya nika mîyanê rijîyayîşêk de ya û yewîya kurdan ra tersena"**

BAZ SÎPAN- MEM LEZGÎN / BEHDÎNAN - ANF

Endamê Akadamîya Îlmê Komelkî ya Abdullah Ocalanî Ozgur Denîzî derheqê babetanê vengdayîşê KCKyî yê seba yewîya neteweyî, zîyaretê Bînalî Yildirimî yê Îraq û Başûrê Kurdistanî, estena PKKyî ya Şengal de û averşîyayîşê ke Vakurê Kurdistanî de benî de qisey kerd.

Denîzî va 'zîyaretê Bînalî Yildirimî yê Başûrê Kurdistanî vengdayîşê KCKyî yê seba yewîye ra dima bî û hedefê ci zî xirakerdişê atmosfero ke amebî awankerdiş bî' û qiseykerdişê xo wina domna: "Merdim eşkeno vajo çend hedefê nê zîyaretî estbî; hedefo yewin, seba ke atmosferêko vengdayîşê KCKyî ra dima virazîya, xira bikerî bî. Yê dîyin zî semedo ke rijîyayîşêko Tirkîya hem herême de û hem zî hetê mîyanneteweyî de cuyena ver, wazena welatanê herême reyde têkilîyan rona. Reyna hedefanê nê zîyaretî ra yewe zî problemê estena qerargehê Tirkîya ke Başîka de yo û hem seba piştîdayîşê çeteyan û hem zî seba dagîrkerî kar keno yo. Her çiqas ke Serekwezîrê tirk Yildirim û çapemenîya tirkan nê zîyaretî bi hawayo baş nîşan bidî, yeno dîyayîş ke bi hawayo ke yeno nîşandayîş derbaz nêbîyo."

### OPERASYONÊ FEHMÎ

Denîzî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant operasyonê fehmî ke Tirkîya de yeno meşnayîş ser û va: "Heme hamleyê ke dewleta tirk hetê dîplomatîk, sîyasî û ekonomîk de kena, seba ke rayapêroyîya xo bixapêna, kena. Ma bi temamî nêzanî hukmatê Îraqî reyde çi ameyo qiseykerdiş, labelê dewleta tirk çapemenîya xo de bi hawayo 'Ma vejîyayîşê PKKyî yê Şengalî ser o pêkerd, munaqeşeyî baş vîyartî û ma Başîka ra nêvejîyenî' nîşan da. Labelê Serekwezîrê Îraqî Ebadîyî dima ra va 'heta ke dewleta tirk Başîka ra nêvejîyo, têkilîyî raşt nêbenî.' Yeno famkerdiş ke Tirkîya de operasyonê fehmî yeno kerdiş."

### DEWAMÊ QIRKERDIŞÎ

Denîzî qiseykerdişê xo de bale ant nizdîbîyayîşê dewleta tirk yê Şengalî ser û wina va: "Raştîya xo de dewleta tirk Başûrê Kurdistan de heme sazî û statuyanê kurdan hedef gêna. Cok ra derheqê Şengalî de îzehetê winasî danî. Wexto ke merdim çîyê rojane munaqeşe bikero, ganî merdim tarîx ra qerifyaye nêgiro dest. Şarê êzidî ser de xeylê hêrişî bîyî û hêrişo peyên de yê ke Şengal û êzidî pawit, PKK bî. Çîyo ke merdimî ra ecêb yeno, sîyasetê Başûrê Kurdistanî û bitaybetî zî vindetişê PDK yo. Ganî hukmatê PDKyî vera nê sîyasetê dewleta tirkî de vindetişêk cîya nîşan bidayêne. Heto bîn ra hukmatê AKPyî Vakurê Kurdistanî de kampê şengalijan veng kerd. Wexto ke merdim bizano yê ke hêrişê Şengalî kerd DAIŞ bî û yê ke înan miqate kerd zî hukmatê AKP bî, o wext merdim hedefê vengkerdişê nê kampî baş fam keno. Vengkerdişê kampî yeno manaya dewamê qirkerdişî."

### DO NÊRO VÎRÎKERDIŞ

Denîzî qiseykerdişê xo de qala Sûr de girdbîyayîşê hemkarîye kerd û wina dewam kerd: "Ez sifteyîn embazê ke Sûr de bi hawayo qehremanî xover dayî, silam kena. Nika Sûr de propagandayêk yeno kerdiş, no zî dizdêya qatilan a. Zîhnîyeto ke qetlîyam viraşt, nika zî wazeno nê xoverdayîşî defin bikero. Hedef tena viraştişê awanîyan nîyo, wazenî bi temamî bibedilnî. Nika zî hemkaran reyde wazenî gonîya ciwanan ser de rant bigirî. Wa bêro zanayîş ke no qet nîno vîrîkerdiş. Ganî şarê kurd vera nêyî de bivindero. Ewja de girdbîyayîşê hemkaran do nêro vîrîkerdiş. Ti hêzê sîyasî û dewlete nêeşkenî vera waştişanê şarî de bivinderî. Ganî her kes vera nêyî de reaksîyonê xo nîşan bidero."

### DO BI EKONOMÎ ŞÊRO

Denîzî krîzê ekonomî ser o va 'ekonomî polîtîkayan reyde eleqeder o' û wina domna: "Eke hetê sîyasî de bêîstîkrarî bibo, şima nêeşkenî ewja de ekonomî duştêko baş de bitepişî. AKP bi polîtîkayanê neolîberalan ame îqtîdar. Ekonomîya AKPyî girêdayeyê sermayeya teberî ya. Çimeyê pereyo ke keweno Tirkîya, dîyar nîyo. Xora nika yew qanûn ameyo vetiş, goreyê qanûnî bi her hawayî pereyo bêusûlî eşkîyeno bikewo Tirkîya. AKP bi polîtîkayanê ekonomîk ame îqtîdar û do bi ekonomî zî şêro. Çapemenîya îqtîdarî çiqas niminena wa binimina, do wina bibo. Rayber Apo wextê pêvînayîşan de tim na babete de hişyar kerdêne. Têkşîyayîşê AKP nizdî yo."

### AKPYÎ HEMÎNAN ROT

Denîzî qiseykerdişê xo de dîyar kerd ke 'sîyaseto ke AKP taqîp keno, sîyasetêko dirî yo' û wina qedêna: "Nika Rûsya reyde pêvînayîşî yenî kerdiş, labelê verê cû tersê ci ameyêne kerdiş. Verê cû Tirkîya Sûrîye de piştî da çeteyan. Yê ke DAIŞî miqate kerd û vera kurdan de da şerkerdiş AKP bî. Tirkîya waşt Rûsya û NATO bîyaro duştê yewbînan û sîyasetêko winasî meşna. Teyaraya Rûsya da waro û îzehetê wişkî ameyî kerdiş. Yê ke îdîa kerdêne ke do Heleb de nimaj bikerî, nika tersê ci de hereket kenî. Hêzê ke Tirkîya piştî dayêne înan, hemînan masa ser de rot. Tirkîya seba bekaya xo eşkena heme çîyan bikera. Tirkîya raştîya xo de Rojhelato Mîyanên de vînî kena."

## Pêvînayîşê
## Astana netîce nêgeno

**DENÎZÎ BABETA** pêvînayîşê ke do Astana de bêrî viraştiş ser o wina va: "Sîyaset de pîvanêko winasî esto; şima hetê tarîxî de çiqas heqdar benî, bibê heta ke hêzê şima yê leşkerî, polîtîk û komelkî nêbî, şima nêeşkenî heqdarîya xo nîşan bidî. Eke şima nê hetan de bitesîr û rêxistine bibî, şima eşkenî sey muxatab bêrî dîyayîş. Cok ra kurdî sey pêvînayîşê Cenevre, eke Astana de zî ca nêgirî, o wext Astana sernêkeweno. Çimkî nika yê ke warî de ca gênî, çeteyî nîyî; yê ke waran de yî YPG, QSD yanî hêzê kurdan î. Bin banê QSDyî de heme hêzî ameyî têhet û resayî pê. Cok ra eke şima hêzo ke winasî nêvînî şima nêeşkenî serbikewî."

Denîzî dewamê qiseykerdişê xo de va 'Pêvînayîşê Astana de Rûsya wazena pêvînayîşêk sey Cenevre bikera' û wina domna: "Tîya de beşdarbîyayîş yan zî beşdarnêbîyayîşê kurdan yeno munaqeşekerdiş. Labelê Tirkîya nêwazena ke kurdî beşdar bibî. Ma nêzanî mîyanê pêvînayîşî de çi esto, labelê çîyo ke ma zanî eke kurdî beşdar nêbî, pêvînayîşê Astana sernêkewenî. Pêvînayîşê Cenevre de Amerîka, Rûsya, Tirkîya û Suûdî û sewbîna heme hêzî estbî. Seba ke pratîk de çinêbî, sernêkewtî. Çimkî rejîm û hêzê kurdan çinêbî. Cok ra sernêkewtî. Xora verfekê Amerîka zî dîyar kerdbî ke ganî kurdî beşdar bibî. Eke Sûrîyeyêka newe do bêra awankerdiş, ganî kurdî zî tede bibî. Eke nêbî no proje sernêkeweno."

Bena hol

## Ver bi Erdoganîzm!



U. Serhıldan Xonçıkij

Awanbîyayîşê Komara Tirkîya ra heta seserra 21. fikro esasin û serdest 'Kemalîzm' bi. No fikr ser o dewlete xo îdare kerde û pêrûnê bedilyayîşî ke qanûno bingehîn de ameyî viraştiş no fikr ser o nêbî zî binê tesîrê nê fikrî de ameyî viraştiş. Xora yeno zanayîş ke dewleta ke ma tede cuyenê hetêk ra zî dewleta derbeyan a û qanûnê ke nika felîyet de yê hema hema perûnê înan qanûnê derbeyan ê.

Nika zî meclis de newekerdişê tay madeyanê qanûno bingehînî esto û nê bedilnayîşî hêna rewşa OHALî de yanî goreyê qanûnanê derbeyan virazîyenî. Pêrûnê madeyê ke AKP waştênê bibidelna meclis de bi rayanê AKP û MHP ameyî qebulkerdiş. Tena raydayîşê pêyîne mendo û aye ra dima refarandûm keweno rojeve. Merdim wexto ke ewnîyeno nê bedilyayîşî ra binêk bifikiro fam keno ke 'Kemalîzm' o ke ma vanî fikro serdest hînî ver bi qediyayîşî de yo, çunkî welatêk de di fikrê serdestî ke bieşkî pîya welat îdare bikerî çin î. Kam eşkeno bivajo ke hem 'Kemalîzm' hem zî 'Erdoganîzm' eşkenî pîya bixebitî… Semedo ke serdestiyêk bêro ronayîş lazim o ke serdestiyo verîn orte ra bêro wedartiş. Aye ra asîyeno ke meclis de 'Kemalîzm' qedîyeno û herinda ey de belayê dîyin o Tirkîya 'Erdoganîzm' yeno ferzkerdiş. Tabî no welat de 'Kemalîzm' bi rehetî vîrê merdiman ra nêşino la bi nê waştiş û kerdenan hêdî hêdî do bihelîyo. Esaso ke 'Kemalîzm' no welat de pay ser de vindarnayêne laîsîzm bî, la hikûmet verê xo tadayo laîsîzm zî; hemwelatîyê ke nika wazenî vera mudaxeleyê laîsîzmî de bivinderî raştê rîyê dewletê yê tûjî yenî. Heta nika ê kesê ke xo ra vatêne 'Kemalîst' yan zî 'Laîsîst' dewleta xo bi nermî û weşî şinasnayêne la ê zî no proses de rîyê dewlete yo bîn şinasnayî. Meclis de dest û lingê înan ameyî girêdayîş, teber de ti kes OHALî ver nêeşkeno vengê xo bikero. Wina hêdî hêdî û binî ra bedelîyeno qanûno bingehîn.

Kurdî par behsê nê rojan kerdêne la ti kes bawerîya xo kurdan ra nêard û kurdan tena verda. Vengdayîşê pêameyîşî ameyî kerdiş la hêna tu kes vengê xo nêkerd. Aye ra nika Tirkîya bîya welatê tenayîyan. Aye ra ma vanî ver bi 'Erdoganîzm'. Wa xelet nêro famkerdiş; wexto ke ma vanî 'Erdoganîzm', seba ma 'Kemalîzm' nêbeno pak. Çunkî ma zanî, seni ke 'Kemalîzm' bi, sîsteme înkar û îmhayî do 'Erdoganîzm' zî eynî çîyan bikero û xora pratîkê her dîyan orte de yo. Seba aye vera pêrûnê serdestan de vatişê 'Ney' heq o. Çira 'Ney', çunkî no welat de eynî çîyî ameyî cuyayîş, aye ra eke pelêko newe bêro akerdiş, gere pêrûnê sîstemî de bedilyayîşî bêrê viraştiş tena seba xurtkerdişê şexsan 'Ney'.

Kam vano yan zî sere ra heta nika kam vatêne 'Ney'? Gere rojawanê Tirkîya de na perse bêra kerdiş. Heta ke no welat de qêrayîşê kurdan mîyanê goşanê şima de cayêko pîl nêtepişo, şima nêeşkenî bivajî 'Ney' û şima ti wext nêeşkenî meseleyanê xo safî bikerê. 1925î ra heta nika kurdî hem semedê xo hem zî semedê şar û bawerîyê binî ke ameyî dûrivistiş û binê neheqî û tedayîyan de cuyenî bêveng nêmendî û bi xoverrodayîşê xo resayî nê rojan. Raşta ci no sîstemê 'Erdoganîzm'î bêro ronayîş yan zî nêro ronayîş seba kurdan çîyêk îfade nêkeno, çunkî ne nika ne zî wexto ke sîstemê serdestî bêro ronayîş neheqî û tedayî nêqedîyenî; tena ê kesî ke xo ver dayî û xo ver danî eşkenî bivajî 'Ney' û heqanê xo bigirî.

www.arsivakurdi.org



Cînayetê Hrant Dînko ke hetê dewlete ra bi vatişê ‘ermenîyo ke dişmenê tirkan o’ hedef ser ro 10 serrî vîyartî la hema zî qatilî nêameyî dîyayîş. Dadgeha ke wextêk qatilî mîyanê Ergenekonî de gêrayêne, nika zî mîyanê cematê Gulenî de gêrena. Pratîkê 10 serrî yê dadgehî nuqtaya ke dadgehe ewro resaya, nîşanê ma dano

# Neynika dadgeha Tirkîya: Cînayetê Dînkî

YASÎN KOBULAN / STENBOL - DÎHABER

Mudirê Weşanê Pêroyî yê Rojnameyê Agosî Hrant Dînk 10 serrî verê amebî qetilkerdiş û serrgêra 10. yê qetilkerdişê ci de hîna zî qatilê ci nêameyî dîyayîş.

Hrant Dînko ke verê cû bi vatişanê ‘ermenîyo ke dişmenê tirkan o’ bîbî hedef û 19ê Çileyê 2007 de hetê keso ke sereyê ci de kumekê sipî estbî, amebî qetilkerdiş. Dima ra vejîya orte ke yê ke ci kişto Ogun Samast o. Dîmenan de amebî dîyayîş ke Ogun Samast aye roje tena nêbîyo. Wextê mehkemekerdişî de amebî dîyayîş ke qeydê kamerayan hetê polîsan ra ameyo pakkerdiş. Her çiqas ke Erhan Tuncel û Coşkun Îgcîyî selahîyetdaran xeberdar kerdbîy zî amebî dîyayîş ke ti tedbîrî nêameybî girewtiş. No qetilkerdiş, qetilbîyayîşê Talat Paşa ke koçê ermenîyan de berpirsîyar bî, mendêne.”

**TI TEDBÎRÎ NÊAMEYBÎ GIREWTIŞ**

Her çiqas ke hetê Mudirîya Asayîşî ya Trabzon û Stenbolî ra ameyêne zanayîş ke do Dînk bêro qetilkerdiş zî ti tedbîrî nêameybî girewtiş û heta qetilkerdişî ra dima nînan belgeyanê cînayetî bi hawayo kêmî erşawitbî û tayînan zî bedilnaybî. Xora amebî dîyayîş ke Mudirîya Asayîşî ya Stenbolî de raporo sexte amebî amadekerdiş. Nîsana 2007 de derheqê Ogun Samast, Erhan Tuncel û Yasîn Hayal zî tede 18 kesan rê doze abîbî û Samastî rê ‘bi plankerdiş merdim kiştiş’ ra 22 serrî û 10 aşmî ceza amebî dayîş. Netîceyê 25 ronîştişanê doze de heme kesî endamîya rêxistine ra beraat kerdbî. Yê ke qetilkerdişî de engişta înan estbî, heme ameyî terfîkerdiş.

**AÎHMÎ TIRKÎYA MEHKUM KERD**

14ê êlule de Mehkemeya Heqê Merdiman ya Ewropaye (AÎHM) netîceyê doze aşkere kerde û cînayet ver Tirkîya mehkum kerde. AÎHMî qerar da ke Tirkîya 113 hezar euro tazmînat bido keyeyê Dînkî. Bi no hawa dosya newe ra abîye û rayîrê mehkemebîyayîşê kesê ke îxmalê înan cînayet de estbî, abî.

**LEŞKERÎ ZÎ EWJA DE BÎ**

Çarçeweya tehqîqatî de amebî dîyayîş ke wexto ke Dînk ameyo qetilkerdiş, cayê hedîseyî de cendirmeyî zî estbîyî. Labelê dozger Gokalp Kokçuyî derheqê cendirmeyan de îdîaname amade nêkerdbî. Teşebusê derbe ra dima eynî dozger çarçeweya tehqîqatî de 20 kesê ke leşkerî zî tede estbî, da tepiştiş. Dima ra eynî çarçewa de zaf hûmarî de leşker û fermandarî ameybî tepiştiş û nînan ra tayê ameybî tewqîfkerdiş. Heta nika îfadedayîşî ra zêde doze de ti averşîyayîş çin o. Rojê ewilî yê cînayetî de qatilî mîyanê rêxistina Ergenekonî de ameyêne gêrayîş, nika zî mîyanê cematê Gulenî de yenî gêrayîş.

# Astana goreyê tayê pêameyîşan bena

## Kombîyayîşê Astana adirbestêko demkî yo

EVÎN ELÎ / QAMIŞLO - ANHA

**BABETE** ser o Hetkarê Hemserekê Heyetê Têkilîya Teberî yê Kantonê Cizîrî Fener El-Keîdî zî wina va: “Kombîyayîşo ke Astana de bêro viraştiş, do krîzê Sûrîye hîna zêde kûr bikero; çimkî yê ke do kombîyayîşî îdare bikerî Tirkîya, Îran û Rûsya yî. Eke hêzê ke herême de estî, beşdarê kombîyayîşî nêbî, o wext problemî çareser nêbenî. Kombîyayîşê Astana seba ke kamcîn grûbî teror î an nîyî, yewbînan ra safî bibî, adirbestêko demkî yo. Do hêzê ke radîkal nîyî zî bidekî binê tesîrê dewleta tirk.”



**DO ÇARESER BIKERO**


El Keîdî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘Kombîyayîşî ra dûrîkerdişê QSD û YPGyî do binkewtişî ra zêde çîyêko bîn nêdo Tirkîya û hemkaranê Tirkîya. No zî beno sebeb ke krîzo ke Sûrîye de esto, do hîna zaf kûr bibo. Ma vakurê Sûrîye de wayîrê hêz û projeyan î. Estena ma do probleman çareser bikero.”

MIHEMED EBDO / HELEB - ANHA

Sûrîye de 2011 ra nata şerêko gird yeno cuyayîş. Hetê şerî de bi mudaxîlbîyayîşê hêzê mîyanneteweyî tayê pêvînayîşî zî ameyî /yenî kerdiş. Pêvînayîşê Cenevre na çarçewe de ameybî kerdiş û 23ê çileyî de yeno vatiş ke do Astana de zî tayê pêvînayîşî bêrî viraştiş.

Endamê Meclîsê Ortaxî yê Taxa Şêxmeqsûdî ya Helebî Yasîr Tîtî qisey kerd.

Tîtî va ‘ganî kombîyayîşê ke seba çareserkerdişê krîzê



Sûrîye yenî viraştiş de projeyê demokratîke bêrî esasgirewtiş’ û wina domna: “Eke kurdî beşdar nêbî, yê ke beşdar bibî temsîlkarîya îradeya şarî nêkenî. Cok ra netîceyê ci de çareserîyêka demokratîke ke heme hetanê Sûrîye bigiro mîyanê xo, nêgeno binê temînatî. O wext qederê Astana zî do bibo sey Cenevre. Yê ke beşdarê Cenevre bîbî ti projeyê înan yê çareserî çinêbî. Hedefê nînan zî pawitişê menfîetê hêzê herême yo.”

**ÇARESERÎ NÊANO**

Tîtî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘eke hêzê herême wazenî wa krîzê Surîye çareser bibo, o wext ganî hêzê ke temsîlkarîya îradeya Sûrîye kenî, dawetê kombîyayîşî bikerî. Teberê Sîstemê Federalî de ti sîstemêko bişînbo krîzê Sûrîye çareser bikero, çin o.

## ‘22 serrî yo ke bêmaben xebetîyeno’

Sendîkaya Egîtîm Seno ke 23ê çeleyê 1995 de awan bîbî, vera hêrişan de bêmaben xebatê xo domnayo. Endamê sendîkayî nîka îxrackerdişê 11 hezar mamostayan ra dima reyna zî bi hawayo çalak xebetîyenî. Awanbîyayîşê sendîka ra nata endaman ser de hêriş kêmî nêbîyo û sendîka de endamê ke ameyî qetilkerdiş zî estî. Labelê endamê sendîka vera heme hêrişan de maben nêdayî xebatanê xo û emser serrgêra 22. yê awanbîyayîşê xo pîroz kenî. Babet ser o Hemsereka Sendîkaya Egîtîm Senî Sabîha Zorlu Kocakayaye qisey kerde.



**SEY ‘TERORÎZM’ BI NAME KENÎ**

Kocakayaye qiseykerdişê xo de hesasîyetê prosese ard vîr û va ‘ma rojanê zaf hesas an ra vîyarenî, îqtîdar heme prosesan de wazena ke şar îtaatê înan bikero’ û wina dewam kerde: “Sendîkaya ma ti rey îqtîdar rê hizmet nêkerda. Sendîkaya ma de embazê ke ameyî qetilkerdiş zî estî. Hedefê ma de yewîya şaran, aştî, azadî, laîkî, heqê wendiş û ziwan estî. Kolemeya ma medya de yena sîyakerdiş û sey ‘terorîzm’ yena binamekerdiş. Seba sîyakerdişê sendîka heme polîtîkayê lîşin yenê meşnayîş.”

Sabihaye da zanayîş ke 81 bajaran de 100 şaxî û 114 hezarî ra zêde zî endamê sendîka estî û wina qedêna: “Sendîkaya ma dewlet û partîyê sîyasî ra girêdaye nîya. Ma her wext hetê aştî û demokrasî de ca girewt. Ganî heme şarî bi ziwan, kultur û tarîxê xo bicuyî. Erdê ma ser de bawerî û kulturê cîyayî zî estî. Ganî ma na raştî qebul bikerî û sey na raştî bicuyî. Ti feydeyê netewperestî û faşîzmî şarî rê çin o.” AMED - ŞÛJIN

# Her tewir şîddet normal yeno dîyayîş

Tirkîya de her ke şono vatişê nefret, şîddet, zayendperest û faşîzmî zêde beno. Dinya de her komele bi ziwan û qiseykerdişê xo yê wişk ya zî nerm yena şinasnayîş. Çareserîya heme probleman bi ziwanê nermî beno.

Babete ser o Endamê Platforma Nijadperestî û Netewperestî Rê Vaje Vindere Nuran Yuceye, Yildiz Onele û Mustafa Ezerî qisey kerdî.

Yildiz Onele qiseykedişê xo de qala ziwanê şîddetî kerde û va ‘Tirkîya ziwanêko netewperest û nîjadperest xebetnena’ û wina dewam kerde: “Tirkîya de her tewir şîddet normal yeno dîyayîş. Ma qetilkerdişê Hrat Dînkî ra dima dî ke nîjadperestî Tirkîya de aver şîya. Bitaybetî zî serrêk û nîmê peyên de hîna zaf aver şîya. Vera înan de têkoşînêko zaf cîddî zî yeno meşnayîş. Serra 1989î de çew nêewtaneyêne tîya de qala problemê cinîyan bikero. Tirkîya de rêxistinê muxalîfan ra yew zî rêxistina cinîyan o. Vera vatişê nîjadperest, netewperest û faşîstan de cewabo tewr gird cinîyan da îqtîdar.”



**TIRKÎYA XO RÊ DIŞMENAN VIRAZENA**

Nuran Yuceye da zanayîş ke vatişê netewperest, nîjadperest û zayendî hetê konseptê milî ra yeno meşnayîş û wina va: “Rewşa nikayîn netîceyê konjokturî ya. Tirkîya heme prosesan de xo rê dişmenan xelq kena. Seba xelqkerdişê dişmenan her tewir argumanan xebetnena û dima ra zî mîyanê şarî de nefret û ziwanê nefretî vila kena. Ganî ma vera neheqîyan de têkoşîn bidî.”



Mustafa Ezerî wina va: “Her proses de vatişê nîjadperestî esto, tena wext yewbînan ra cîya yo. Kesê nê vatişan vanî dîyar î û qanûno bingeyî ra hêz gênî. Çimkî ti kes ceza nêdano înan. Ganî ma heme bibî yewe û bêrî têhet. Ma do heqê merdiman bîdî ronîştiş.” STENBOL DÎHABER



www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
18 Çile Çarşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
*Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. *No:* 23/A *Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık
Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. *No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
*e mail:* rojevamedya@hotmail.com



# Ji metropolan ber bi Çiyayê Kaz ve

Jina bi navê Zeynep Pekîner ku bajaran dişibîne 'girtîgehên nîvvekirî' û parkan jî ji bo zarokan dişibîne 'girtîgehan' bi zaroka xwe Ekîn a 3 salî re Stenbol terk kir û li Çiyayên Kaz bi cih bû û bi hevalên xwe re jiyana ekolojîk ava kir. Pekîner ji bo kesên ku ji jiyana gundan hez dikin lê li bajaran dijîn jî got ku divê bi cesaret bin. Pekîner anî ziman ku ew li dijî pergala ku jiyana mirin û mêtingeriyê ferz dike derketiye rê û wiha got: "Dema zarok bûm jî min ji xwezayê hez dikir. Lê piştî bûm dayik ev hezkirina min zêdetir bû. Min xwest kurê min Ekîn kokên xwe nas bike." Pekîner destnîşan kir ku hînbûnên li bajer li vir xwe tev li xwezayê dikin û wiha pê de çû: "Li vir rojên sayî cil tên şûştin. Em firaq û cilên xwe bi ava ji nav zinaran tê, dişon. Jiyana vir ji jiyana bajêr xweştir e. Her tişt ji xwezayê ye." Pekîner diyar kir ku ew di konekî ji kulavê hatiye çêkirin de dimînin û da zanîn ku êdî kurê wê Ekîn dizane ku ruhê xwezayê jî heye û wiha domand: "Ekîn êdî azad mezin dibe. Dema ji axê tiştekî fêr dibe gelekî kêfxweş dibe. Li derdora me zarok tune ne lê hevalên wî li gundên din hene. Dem bi dem bi wan re tê gel hev û dilîze." Pekîner destnîşan kir ku tecrubeyên ku wê li vir qezenc kirine li tu derê qezenc nekirine û destnîşan kir ku xweza her saniye tiştekî bi mirovan dide fêrkirin. ŞÛJIN

## Ji ber qutbûna ceryanê nikarin tu karî bikin





Esnafên taxa Xaçortê ya navçeya Rêya Armûşê ya Wanê, ji ber qutbûna ceryanê êdî nikarin tu karî bikin. Esnafên êdî ji ber pirsgirêka ceryanê nikarin tu tiştî bikin, her çi qas têkildarî mijarê gelek caran serî li walîtiyê dan jî, lê belê heta niha tu çare nehatiye dîtin. Ji esnafan Mahmut Baykara anî ziman ku ev 2 sal e tu qezenceke wî tune ye û wiha got: "Ji bo taxa Xaçortê ku di çavên dewletê de ev tax hemû PKK'î ne, tu pirsgirêk nayên çareserkirin."

Ji esnafên taxê Şîrîn Aslan jî diyar kir ku ji ber qutbûna ceyranê gelek berên wê xera bûne.

Aslan îdia kir ku bêyî sedem ceryan tê qutkirin û destnîşan kir ku her cara ku ew li rayedaran digerin pirsgirêkên teknîkî didin der. Aslan anî ziman ku li dijî taxa wan muameleyeke taybet tê kirin û got ku ji ber vê tu pirsgirêkên wan nayên çareserkirin. WAN - DÎHABER

## 'Ez ê bi karê xwe serweriya mêran têk bibim'

Li bazarên Wanê ku her roj li taxeke cuda tê avakirin, jina bi navê Ozlem Garîp li gel bertekên esnafên mêr li bazarê karê esnafiyê dike. Garîp ku di nav 500 seyarfiroşan de tenê ew jin e, anî ziman ku ew ji bo hejmara esnafên jin zêde bike hemû zîhniyeta serdest a li dijî jinan serobino dike û bang li hemû jinan kir ku li şûna li malê li televîzyonê temaşe bikin bila bên bazara taxê. Garîp ku li bazarê nevresîman difiroşe destnîşan kir ku li Wanê ji ber nêrîna li hemberî jinan esnafên jin zêde tune ne û wiha got: "Li vê bazarê mêr, ji ber ku ez jin im cuda li min dinêrin. Lê hêza jinan ji hêza wan mezintir û xurttir e." Her wiha Garîp di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku nêrîna kesên tên bazarê erênî ye û bi taybetî jin ji wê danûstandinê dikin. WAN - ŞÛJIN

# Radyoya Dengê Reqqayê mizgîniya azadiyê dide reqqayiyan




**Hêzên HSD'ê yên ku ji bo rizgarkirina bajarê Reqqayê operasyon dane destpêkirin, bi avakirina radyoya bi navê Dengê Reqqayê xwe digihînin gelê Reqqayê û bi rêya radyoyê mizgîniya azadiyê didin w**

NAZIM DAŞTAN / REQQA - DÎHABER



Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) ên bi navê "Xezeba Firatê" ber bi Reqayê ve diçin, ji bo bi awayekî ewle sivîlan ji herêma operasyonê tehliye bikin bi radyoya Dengê Reqqayê ava kirine, pêwendiyê datînin. Radyoya ku li ser frekansa 106.7'an weşana xwe dike, bi du zimanan mizgîniya wekhevî, aştî û jiyaneke hevpar dide gelan.

Radyoya ku li herêma operasyonê kêlî bi kêlî geşedanan radigihîne reqqayiyan, ji aliyê çapemeniya HSD'ê ve tê birêvebirin. Ji xebatkarên radyoyê Roder Miho got ku ew bi rêya radyoyê pêwendiyê bi gel re datînin û der barê operasyonê de agahiyan radigihînin. Miho diyar kir ku di heman demê de ji bo gel bigihînin herêmên ewle bangewaziyan jî dikin û wiha axivî: "Em hemû geşedanên operasyonê ji gel re radigihînin. Di vê pêngavê de karê me yê sereke ewlehiya mirovan e. Em kêlî bi kêlî ji gel re radigihînin ka ku der di destê şervanên HSD'ê de ne, ku der di destê çeteyên DAIŞ'ê de ne."

Miho ragihand ku di heman demê de ew geşedanên Reqqayê radigihînin cîhanê û şervanên li herêmên din jî û destnîşan kir ku ew bi vê rêbazê motîvasyon û moraleke baş didin şervanên li herêmên operasyonê û wiha domand: "Em 24 saet weşanê dikin. Her kes dikare li ser frekansa 106.7'an radyoya me guhdar bike. Niha em tenê bi zimanê kurdî û erebî weşanê dikin. Di rojên pêş de dê ev rewş biguhere û em ê bi gelek zimanan weşana xwe bikin."

Miho anî ziman ku radyoya wan deng û rengê gelan e û diyar kir ku ew bi rêya radyoya xwe mizgîniya jiyaneke wekhev û azad didin û wiha berdewam kir: "Gelê Reqqayê dixwaze çi hîn bibe, em hemûyan parve dikin. Ji bo ku em vê mezintir bikin pêdiviya me bi piştevaniya gel heye. Em bi weşanên xwe bi hawariya gelê xwe de diçin. Em ji wan re dibêjin, 'hûn ne bi tenê ne, em hatine we rizgar dikin.' Em dixwazin hembêza xwe ji hemû gelê Reqqayê re vekin."







# 'Girêdana gelan em rizgar kirin'

Firez Keşîşan ku di sala 1928'an de piştî fermana qirkirina ermeniyan pêşiyên wan koçî Serêkaniyê kir, yek ji şahidê şerê sala 2011'an ê Serêkaniyê ye. Keşîşan qala şer û dilsoziya gelê Serêkaniyê û sedema hatina xwe ya Serêkaniyê kir.

Keşîşan anî ziman ku ew ji ber ku nêzîkî sînor bûye û nêzîkatiya gelê Serêkaniyê ya li vir wiha got: "Di fermana qirkirina ermeniyan de kalikê min koçî Serêkaniyê kiriye. Ji ber ku kalikê min nexwestiye ji sînor qut bibe, li Serêkaniyê bi cih bûye. Ji sala 1928'an heta niha em li Serêkaniyê dijîn. Destpêkê dema hatin vir ji axa vir, ji miletê vir hez kirin, ji biratî û mirovahiya vir hez kirin. Ji ber vê jî ji bo me Serêkaniyê pir bi qîmet e. Dibe ku van salên dawîn me hin zehmetî kişandibin. Lê Serêkaniyê ji bo me wek ku bav û kalên me çawa ji bo me behs kirine ew qas giranbuha û şîrîn e."

Keşîşan di berdewama axaftina xwe de behsa şerê Serêkaniyê yê 2011'an dike û dibêje ku di wî şerî de gel pir zehmetî kişandine û ev tişt anî ziman: "Dema çete ketin Serêkaniyê bi rastî jî tiştek nema. Jiyan hat sekinandin. Lê li gel vê jî min tu carî derketina ji Serêkaniyê qebûl nekir. Ez bê nan û bê av mam lê dîsa jî dev ji axa xwe berneda. Milet dema ku pê hesiya ez bê nan mame, her kesî ji min re nan û av anîn. Ez her dibêjim, ji ber ku miletê Serêkaniyê wisa baş bû, xwedê alîkariya wan kir û em dîsa gihaştin jiyana xwe. Gelê vir li gel ew qas nebaşiyê tu carî însaniyetiya xwe winda nekir." Keşîşan destnîşan kir ku piştî bajarê Serêkaniyê ji aliyê şervanên YPG'ê ve ji çeteyan hatiye paqijkirin ew careke din gihaştine bajarên xwe û wiha domand: "Piştî rizgarkirinê em û gelê vir bi hev re me dest bi avakirina warên xwe kir."

Her wiha Keşîşan di dawiya axaftina xwe de bang li hemû gelê ku welatê xwe hiştiye û çûye kir ku vegerin ser axa xwe. SERÊKANIYÊ - ANF



www.arsivakurd.org